

PIRS

Kovareke Rewşenbîrî û Serbixwe ye

Hejmara 48an hejmareke taybet e ji bo goçkirina hevalê me
Rezoyê Osê endamê desteya birêvebirina kovarê hatiye
amadekirin.

NAVEROK

-Pêşgotin:

- Rêwresmên xakspartina nivîskar û zimanzanê Kurd Rezoyê Osê:

- (gotin... name... birûsk...)

- Rêwresmên çelrojîya şaşbarkirinê:

- Ahenga Qamişlo

- Gotin , name , birûsk... ên hatin xwendin

- Lêkolîn , gotar , helbest... ên şihane kovarê.

- Ahenga bajarê Hannovera Almaniya

- Ahenga Berlinê paytexta Almanya

- Ahenga Stokholmê paytexta Swêdê.

- Gotinên vebjarte ji Êntîrnêtiê û lînîsa seredana serxweşkirinê

- Nivîsareke vebjarte ji yêr Rezoyê Osê di hejmara kovara Pîrsê ya 35an de hati bi
belavkirin.

kovarapirs@yahoo.com

Buha 50 L.S

Heval Rezo... !

**Erê mirinê govdeyê te ji nav me bir, lê pêjna te herdem li
ber çavên me ye**

Piştî kefecaneke dirêj bi jana Pençejan/Pençeşêrê re, nivîskar, zimanzan û rewşenbîrê navdar, endamê desteya rêvebir a kovara me kek REZOYÊ OSÊ, li roja 4.3.2010an li bajarê Qamîşlo jiyana xwe ji dest da. Li roja din 5.3.2010an jî govdeyê wî yê pak, li cihê jidayîbûna wî, li gundê Dekşûriyê hat veşartin.

Li roja xakspartinê, hejmareke mezin ji rewşenbîr, nivîskar, berpirs û endamên partiyên siyasî, nûnerên saziyê mafên mirovan, welatîyên ji hemî netewe û olên Cezîrê, ligel malbat û mirovên wî, bi darebesta wî re bi rê ketin, û li rêwresmên xakspartinê amade bûn.

Beşdaran mixabinya xwe ya ji dil û can de, ji bo goçkirina merovekî wiha qedirgiran diyar kirin, û dupat dikirin, ku mirina kek "Rezo", ne tenê ji ziman û çanda Kurdî re ziyaneke mizin bû, lê belê ji hemî pêkhatiyên netewî û olî re li herêma Cizîrê jî jidestdayîneke berçav bû.

Bi rastî jî, kek "Rezo" ji bêtirî çel salî de di warê raman û nivîskariyê de dixebite. Wî barê gelê xwe, nemaze di warê parastin û pêşxistina zimanê Kurdî, danî bû ser milekî xwe, û pêkanîna azadî demoqrasiyê ji hemî gelê Sûryê re danî bû ser milê din.

Li roja xakspartinê, li bin konê serxweşkirinê û di malperên êntêrnê de jî, gelek gotinên hêja li derbarê goçkirina wî hatin gotin, xwendin û nivîsandin, di wan gotinan de sinciyên kek "Rezo" yên bilind, salixên kesayetiya wî ya cidawaz û torevanî û payebilindiya wî di warên ziman, çand û welatperweriyê de bi bîr tanîn û bilind dinirxandin.

Ji bona lidarxistina çelrojîya ciwanemerg "Rezo" jî, kovara "Pirs" li roja 15.4.2010an ahenga boneya Çelrojkê li bajarê Qamîşlo li dar xist. Lê ji ber helwestên destlatê di tenga gelê Kurd re, aheng bi dizî û di cihekî ne li gor meqama Kek Rezo de

hat lidarxistin, ji ber wê yekê jî hejmareke biçûk û vebjartî ji dost, rewşenbîr, nivîskar, helbestvan, zimanzan, malbat û berketiyên wî ji Cezîrê, Helebê, Efrînê û Şamê hatin vexwendin. Gelek lêkolîn, gotar, helbest, name û birûsk ji welêt û ji derveyî welêt ji bo wê boneyê giha bûn komîteya amadekar, lê ji ber rewşên ewlehiyê û kêmbûna demê jî, tenê hinek ji wan hatin xwendin.

Bi rastî jî û bi şhadeta pêzanan, ciwanemerg "Rezo", karekî bê westan û hêja di ber çand û zimanê Kurdî de kir, û bi pêdarî baweriyên xwe parastin û jê re rastgo bû. Ew ji hevalên xwe re jî dilsoz bû.

Wekî ku em dizanin, kekê me "Rezo" ji sala 1993an de, ango ji destpêka derhatina kovara "Pirs" de, herdem endamê desteya rêvebirina wê bû, ew di hemî karûbarên wê de weke endamekî çalak beşdar dibû, û ta dawiya jiyana xwe xemxwarê wê bû. loma jî desteya rêvebirina kovarê biryar da, ku hejmara (48)an ji kovarê bibe hejmareke taybet, û hemî gotin, lêkolîn, name, helbest û birûskên ku li roja xakspartina kek "Rezo" û li boneya çelrojê jî giha bûn desteya kovarê, çi yên hati bûn xwendin û çi yên ne hati bûn xwendin, di hejmara taybet de werin weşandin.

Li ber roniya biryara desteya rêvebirina kovarê, ev hejmara taybet dê ji çar beşan pêk were:

- Beşê yekem: Gotin û nivîsarên roja xaspartinê.
- Beşê duyem: Karûbarên boneya çelrojê.
- Beşê seyem: Gotinin vebjarte ji Êntirnêtê û lênûsa seredana serxweşkirinê
- Beşê çarem: Nivîseke vebjartî ji nivîsarên Rezoyê Osê, ku di kovara Pirsê de hatiye weşandin.

Em baş dizanin, ku mirovên wek Rezo xwe bi xwe nemirî dikin, û em herdem dendarê wî ne. Lê em hêvîdar in, kani bin beşekî biçûk ji kar û rindiyên wî di mirina wî de lê vegehin.

Rêwresmên Xakspartina
Nivîskar û zimanzanê Kurd
REZOYÊ OSÊ

Qamişlo îroj, În 5/3/2010 li Gundê Dekşûriya (bakur-rojhilata bajarê Qamişlo), bi beşdarbûna cemawerekî zor ji heval û dost, nivîskar, rewşenbîr, partiyên kurdî, û komîteyên mafê mirovan, nivîskar û zimanzanê Kurd, mamoste Rezoyê Osê, ku piştî berxwedanek dirêj li hember nexweşiyek kujek, duh li Qamişlo canê xwe ji dest da, hate xakspartin.

Piştî termê hêja Rezo hat binaxkirin, çend helbest û gotin li ser gora wî hatin xwendin, li destpêkê helbestvan **Dildarê Mîdî** bi vê helbesta xweyî xemgîn dest pêkir:

Belê avdarê destpêka buharê.. bi şînê bi şahiyê.. xedarê evîndarê.. te dîsa xwe eşkere kir avdarê.. te rojek dî nîşan kir avdarê.. te stêreka geş di ismanê toreya Kurdî anî xwarê avdarê.. te guleka geş li ser dara rengîn

çilmisand û vemirand avdarê.. belê mamoste Ebdul Rezaq navê teyî herî şêrîn li cem me Rezo.. te îro piştî xwe da mîletê xwe, te ew çavên xweyî zelal girtin.. te dilê me teva şikand û te rondik ji çavê me anîn xwarê.. ax avdarê..

Paşê mamoste Konê Reş Gotina heval û hogirên mamosta Rezo, yê nivîskar, xwend: spas sipas ji we tevan re, sipas ji westandina we re, îro bi dilekî xemgîn, şikestî û bi keser em xatirê dawî ji mamosta Rezoyê Osê dixwazin, yê kû wek heval û hogirekî me bû, yê kû wek stêrek geş bû di nav rewşenbîr û nivîskarên Kurdên sûriyê de, xuya ye ku tracîdiyêke bi xem Kurdan û miha avdarê bi hev re girêdide, va roja 4ê avdarê jî serê xwe Hilda û mamoste Rezoyê Osê ji nav me dizî ... hê zû bû ji çûna wî re, hên jî pêdiviya rewşenbîriya Kurdî bi wî û kesên

wek wî hebû , lê wek kû kurdan gotiye: dinya baqê nîvciye, erê baqê nîvciye.....

Her weha birêz Konê Reş bi ferehî li ser jiyana wî sekinî, ji destpêka jidayîkbûna wî li Gundê Dekşûriyê û xwendina wî û kar û xebata wî di warê nivîsandin, werger, wêje û zimanê kurdî de, û perpisyariya wî ji gelek rojname û kovarên ku bi zimanê Kurdî derdiketin, û her weha çalakiyên wî yên berçav di komît û komeleyên rewşnbîriya Kurdî û di warê ziman de, û beşdarbûna wî di festival û mehrecanên ku li Kurdistan û derveyî welat çêdibûn.

Paşê Bavê Helbest bi navê **desteya kovara Pirsê** gotinek kir û wiha got: Ma gelo ezê çi bêjim , bi rastî zimanê min peyv winda kirin, ezê çi bêjim mamoste, gelo te şîretkar li pişt xwe ji me re hiştin ? şîretkar di warê ziman û rêzmanê Kurdî de, tim vî mamosteyî digot: Çi karê ku di berjewendiya kurdevariye de be, cavê xwe jê ne girin... Pişt re gotina kovara PIRSê Xwend.

Gotina kovara PIRS

Malbata mamoste REZO!

Rewşenbîr û berketiyên zimanê Kurdî!

Me di desteya Kovara PIRSê de, bi dilekî tev kul, keser û kovan nûçeya dilêş a koçbarkirina rewşenbîrê Kurd ê navdar, endamê payebilind ê Kovara me Rezo Osê bihîst.

Buhuştî, di dirêjahiya temenê xwe de, ji bo ziman, wêje û toreya Kurdî xebateke tekûz û pîvayî bi rê ve dibir. Li ser vê rêya dirêj a tev rêl û kelem, gelek cefa û astengî dîtine, lê wî bi dilê germ û hişê xwe yê vekirî ew derbas kirine. Weke me bira û mamoste Rezo di xebata hevbeş a Kovara Pirsê de naskiriye, ji bo kar û xebatên bilindkirina asta ziman û wêjeya Kurdî, ew mirovekî cansivik û pêşeng bû, bê dudilî, erk ustubarên xwe pêk tanîn.

Hemberî vê boneya gewre, Kovara PIRSê reş girê daye, bi melûlî û ustuxwarî gurzek gul diyarî rewanê wî dike, serxweşiya hemî rewşenbîr û berketiyên ziman û wêjeya Kurdî dike.

Bila gora te buhuşt be mamoste Rezo.

Serê malbata we xweş be!

Kovar PIRS 05.03.2010Z/ 2621K

Gotina Rewşenbîrên Amûdê

Paşî birêz **Arşek Baravî**,
Gotinek bi navê rewşenbîrên
bajarê Amûdê xwend, ev e deqa
wê:

Zîmara mihre Rizoyê Osê

Ne hemû roj bi tîrêjên
hêviyan dest pê dibin..lê - hemû
roj bi gef û fort û
berhemgariyan destpêkerin.

Dema ku hay û hest ji hev
belav dibin, yadîgarî xwe di
kuşê û qurçikên nejbîriyê de
vedîşêrin .. daku kêferata hay û
hestan radiweste, dil û hiş
vediwesin.., yadîgarî ji nû ve bi
bîranînan re xwe didine der...
ango viyanê bi şêna mirovî şa
dikin, havil di êş û jana xwe de
ji ber zîyanên berjewendiyan
dikizkize..., çareseriyê di liveke
lerzok de taya tirsê girtiye,
nûşîya kat û demê jî hên ne
holisiye..., asîman zuha bûne..
stêrkin hîwî şînahiyê di asîman
de jal dikin..., keldûmana
ronakbîran dara jîyanê av dide,
zewenda hermayan azarên
exterê bextereşan di bîr tîne.

Mamoste Rizo: Veşartokên
tirsonekan kavil dikir û kêlên

goristana kînê diherifand, jîyan
kedî dikir û lê dibaniya, lê bi
koçberiya xwe stûnek ji jîyana
çand û wêjeya Kurdî hilweşand.

Jîyana mirovî hermaye.. bi
komahiya hemdelîveyên demê
re vîn û hezê dide ardiwê
ponijandinê,.. taku kêferata hay
û hestan vemale û hizir û raman
xwe ji erkê radeya çerxa demê
binasin , ango melevanî
bilîmetan peyda dike, zanyarî
pîtol û hozanên şevên tarî bi
bizava komahiyê re dinasîne
.....Leşkerên nepen ji şanişînên
tariyê.. di dema raperîneke
galdanan de dipejirin û nas
dibin .

Mihre Rizo: Ne ji jîyaneke
were û miftî hatiye, belê ew ji
hedan û arama dawerê Kurdên
jîndar û ne nişkavî nûvar bûye,
naşê navdar bê encam nasyar
bin, loma ronahiya karê ewî
peyarê pît rêya rêwiyan rêdûr
çirisandiye û bûye homanê
deşteke ku koçber lê holisîne,
weke ku hemû jîyana xwe
kiribû raje û pasvaniya wêjeya
gelê xwe de, pêdivêye ku em
evan hêjayêd xwe ji bîr nekin, û
doza wan bişopînin, daku canên
wan di aramgehan de biholisin .

Bi navê nivîskar û rewşenbîr
û hevalên mihre ji Amûdê,
sersaxî û xweşnoşî ji malbata wî

re bi taybetî û ji gelê kurd re bi
giştî .

5 / 3 / 2010

* * *

Gotina malbata Osê

Dr. Memo gotina malbata
Osê xwend, û wiha got:

Ey parêzvanê peyva resen
Rezoyê delal... ey sembola vîna
ji hesin, dostê heval... evîndarê
gul û sosin nefş û lal... te ziman
kir evîna mezin şîrê helal... bi
te ziman şîrîn bû xema nexwe
.... Bi te jî gotin bedew bûye
dûrî cefa ... bi te nifşek ji dayik
bûye pir bi şeref e... ziman
delal zelal bû ye ey qehremanê
bi wefa ... te xwe ji can û dil
daye te kêr nekîr, te tucarî ji vê
dozê bernedaye derî vekir... bi
te Kurdî jî zîldaye kesî li te zêde
nekîr... te çî ked û xwêdan daye
ey hilgirê hizr û fikir... eşqa te
ji Kurdî re bê sînor bû, wê her
tim bijî wê mînakê nivîskarê
canfidayê ji welêt re dipûnijî
fêde nake hêsir û fermêsk li ser
bîbarînim, lê Rezoyê dûr ji min
dijî ... ji nav me barkir bi
lezgînî wek şepolê derya mezin,
te deng veda wek çîrûsk û
şewqên ji esmên yên li ser me
dirijîn.. tu mezinî bavê Salar, tu
gor bihiştî bi germiya evîna te

hertim bijîn, tu namirî, tu di nav
cerg û dilê me de hertim dijî...

Dr Memo berdewamkir: Em
sersaxiya we teva dikin, bi rastî
Rezo stêrkek e ji esmanê wêje û
torevaniya kurdî rijiye, siwarekî
hespa kihêle îro peya bûye, em
pênûseka bi hêz û xurt winda
dikin, em bi hêvî ne ku gora wî
biheşt be û hêviyên wî jî bi cih
bên.

Wek çawa li destpêkê, li
domahiyê jî, Helbestvanê kurd ,
Dildarê Mîdî bi vê parçe
helbestê, rêwresma xaksipartinê
bi dawî anî:

**Ey felek ta kengî tê li min bikî
fen û çew.. ta kengî ezê bangkim
tê bêjî tew.. ta kengî ezê nalim û
tê bikî xew.. ta kengî ezê gazîkim
û tê bêjî meke lewlew.. ey felek
ma ez bê xwedî me, ma ez sêwî
me, yan ez ji mar ji Gur cêwî
me.. bes e feleka bê bext bes e
bes e..**

Hêjayî gotinê ye, ku gelek
Birûskên serxweşiyê jî ku
hatibûn şandin, li ser gorê hatin
xwendin.

**Li Qamişloyê
Kovara Pirsê
ahenga çilrojîya nivîskar û rewşenbîrê Kurd
REZOYÊ OSÊ li dar xist**

Bi beşdariya birek ji rewşenbîr, nivîskar, hezker û malbata nivîskarê hêja Rezo yê Osê, li êvara pêncşembê 15/04/2010Z, bi xuleyê bêdeng li ser rewanê pak ê Rezo û rewanê hemî cangoriyên Kurd rêwresmên yadê çilrojîyê dest pê kir.

Li destpêkê pêşkêşvanê karûbarên boneyê ev gotina nivîsandî xwend:

Beşdarên hêja û bi rûmet...

Li destpêkê, bi navê Komîta birêvebir a Kovara PIRSê, em bixêrhatina we dikin. Hêvî û omîda me ew e, ku di vê ahenga çil rojîya nivîskar û rewşenbîrê Kurd ê hêja, bira û hevkarê me Rezo yê Osê de, em bi hev re sinciyên wî yên bilind û mirovane bi bîra xwe bînin, kar û xebata wî ya çil salî di ber

çand û zimanê Kurdî de, bi rêz



Pêşkêşvanê ahengê

û rûmet binirxînin.

Ji ber rewşa ewlekarî ya taybet a vê heyamê, me nîkarîbû hemî dost, heval, hogir û hezkerên kek Rezo di vê şevê de beşdar bikirana, em lêborînê ji we û hemî rewşenbîrên Kurd yên derveyî vê civatê dixwazin, hêvîdar in hun kêmasiyên me bibexşînin.

Xwişk û birayên rêzdar...

Li nik desteya Kovra PIRSê biryar e, ku di hejmarê wê ya bê de, dosyake fireh yan hejmareke taybet li ser kek Rezo bête weşandin. Ji ber wilo jî, berhem, nivîs û lêkolînên ku li ser gorbuhuştî ji me re hatine, em ê wan di wê hejmarê de biweşînin, herweha, emê derfetê ta dawiya vê mehê bidin nivîskar û hezkerên wî, kesê ku bixwaze li ser binivîse, ew dikare berhema xwe li ser navnîşana Kovarê bişîne.

Berhemên ku ta niha gihane desteya Kovarê, ev in:

1- Lêkolîneke Rojnamevanî bi sernava (Rezo zindî ye) bi pênûsa nivîskar û endamê Komîta Kovara PIRSê yê berê, birêz Dilovan hatiye nivîsandin.

2- Lêkolîneke zengîn û berfireh bi sernava (Rezoyê Osê, Kurdîzan, ronakbîr û folklornas) bi pênûsa endamê Komîta Kovara PIRSê yê berê mamoste Berzo hatiye nivîsandin.

3- Helbestek ji helbestvan Arşek Baravî bi sernava (Yadîgariya Çilîniya Mihre



Beşek ji beşdarên

Rezo Osê) giha şevê û hin malik jê hatin xwendin.

4- Helbestek bi sernava (Rêheval Rezo) bi pênûsa helbestvanê Kurdê hêja Mihemed Elî Heso giha şevê û hin malik jê hatin xwendin.

5- Helbestek ji helbestvan Tengezarê Marînî bi sernava (Peyv di çavên min de man) giha şevê - hin malik jê hatin xwendin.

6- Helbestek ji helbestvan Melevan Resûl bi sernava (Çavê min dawerivîn) giha şevê, -hin malik jê hatin xwendin.

7- Helbestek ji helbestvan Mehmûdê Badilî bi sernava **EM** giha şevê.

8- Helbestek ji helbestvan Fîxan Osê bi sernava (Hestê min) giha şevê.

9- Helbestek bi sernava (Keskesorek ji Dekşûrî) ji helbestvan Abdusemed Mehmûd giha şevê.

10- Birûskek ji Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê Zinar Soran giha şevê - hate xwendin.

11- Nameyeke ji Desteya birêvebir a çilrojiya Rezo li Hanover û endamên Kovara PIRSê yên berê Heyder Umer, Merwan Osman û Tengezarê Marînî giha şevê (hin movikên bijarte jê hatin xwendin).

12- Birûskek ji birêz Nazlî Xelîl (Diya Fuad) ji Stockholmê giha şevê-hate xwendin.

13- Birûskek ji Kovara AL-Hîwar giha şevê - hate xwendin.

14- Helbestek bi sernava (bo Rezo Osê bi tena serê xwe) ji helbestvan Arjen arî ji Amed ji kurdistana bakur piştî şevê giha kovarê.

15- gotarek ji mamostê hêja Deham Ebdulfettah bi sernava (Tu çûyî...! Lê, tû jibîr nabî heval ...!!), piştî şevê giha kovarê.

16- gotarek ji mamoste Heydr Omer ji wê boneyê re hatibû nivîsandin, paşê giha kovarê.

Gotina Kovara PIRS

Piştî wê pêşgotinê, gotina Kovara PIRSê ji hêla pêşkêşvanê civatê ve hate xwendin, ev e deqa wê:

Xûşk û birayên hêja...

Bi boneya çelrojiya goçkirina mamoste û birayê me yê hêja Ebdirezaq Osê, emê dîsa bêjin, bila serê malbata wî, hevalên wî yên di komîta birêvebirina Kovara PIRSê de, serên hemî nivîskar û rojnamevanên Kurd û dost û hevalên wî xweş be.

Hevalên Berêz...

Digel ku em niha di boneya bibîranîna çelê hevkarê xwe yê hêja Kek Rezo de ne, lê bi rastî, em qet hestewar ne bûne, ku ew ne di nav me de ye, yan ji nav me bar kiriye û bi rêwîngiyeke bê vejer de çûye. Çinkî mirovên mezin, ta ku ji rûyê zemînê wînda bibin, û demên dirêj jî di ser mirina wan re herin, ew ji bîr û balan naçin, û cihên wan herdem di dil, hiş û ageha mirov de nîgarkirî

dimînin. Ji ber ko, mirovên afranvan, mirovên sûdar, mirovên xudî kar û berhem, rehên xwe bi kûranî berdidin

Belê!.. Kek Rezo, dareke berhemdar û kaniyeke zelal bû, ta roja xwe ya dawîn, gulistana çanda welat û gelê xwe bi camêrî, cangorî û bi zanebûn av dida, loma jî, em wek hevalên wî yên desteya weşandina Kovara PIRSê, pêjna wî ya şêrîn, sinciyên wî yên zor bilind û cangoriya wî ya bê mînak, dê her û her li ber çavên me bin û nirxdar bimînin.

Biraderên hêja..

Em tev dizanin, ku kek Rezo rewşenbîr û çalakvanekî bê westan bû, ew di gelek warên çand û wêjeya Kurdî de dixebitî. Wî ji sala 1970ê de, dest bi nivîsandina Kurdî kiriye, û bi dehan berhemên ji hemî rengên nivîsînê, di hemî warên çand û pirsên gelê Kurd de nivîsiye.

Ji bilî wê, wî di gelek kovar û rojnameyan de jî karê nivîskarî û rojnamevaniyê kiriye.

Ji bilî ku, wî xwe di danheva kelepûra Kurdî de jî diwestand, û gelek berhemên wî yên pir hêja, nemaze di warê çêroka

nava xaka pîroz, û navên wan li ser rûpelên dîrokê, û di ageha civakê de bi mafdarî tên tomarkirin.

folklorî de, hatin çapkirin û belavkirin.

Di vê babetê de, belkî piraniya xelkê me, û gelek beşdar jî nizanin, ku Kek Rezo ji destpêka derhatina kovara PIRSê de li sala 1993an, herdem endamê komîta weşandina wê bû, û li dirêjiya wan salan, endamekî zor çalak û berpirsiyar bû, ew li hemî nivîsarên ku di kovarê de dihatin weşandin vedigerî, û tê de zor şareza bû. Li dema ku nexwaşî lê giran bû bû jî, dîsa ji kar û barên kovara xwe bi dîr ne ket, herdem lê dipirsî, ew dişopand û xema wê dixwar.

Beşdarên berêz...

Nivîsarên Kek Rezo, yên ku di kovara Pirsê de hatine weşandin, ji gelek cureyên nivîsê ne, wek: Lêkolîn, çêrok, gotar, çêrokên kelpûrî, werger, rêportac, helbest,.. û hwd. Ew nivîsar di piraniya hejmarên kovarê de hatine weşandin, carina jî du berhemên wî di hejmarekê de hatine belavkirin.

Bi vê boneyê, emê nivîsarên wî, yên ku di kovara PIRSê de hatine weşandin, bi bîr bînin.

Nivîsarên wî ji hejmara yekê de, û ta hejmara 46an ev in:

Çêrok:

Sê Kurteçêrokên Rezo, bi navê (Aro) hatine weşandin, ew jî ev bûn:

1. (Rotika yadê pîrê), çêrokeke civakî ye, di hejmara yekem de hatiye weşandin.

2. (Hêlîna talankirî), çêrokeke civakî ye, di hejmara duyem de hatiye weşandin.

3. (Newala xencerê), ew jî çêrokeke civakî ye, di hejmara çarem de hatiye weşandin.

Çêrokên folklorî:

Li gor hinek baweriyên, belkî kek Rezo ji nivîskarên herî baş bû, ku çêroka folklorî nivîsiye, gava mirov wan çêrokan dixûne, mirov axaftina bav û bapîran, û Kurdên sade û zimanpak tê de dibîne, ew çêrok jî ev bûn:

1. (Kerkurmî û Çoxsoro), di hejmara 12an de, bi navê Rezo hatiye weşandin.

2. (Fatika Gavan), çêrokeke folklorî ye, ji bo zarokan. Di hejmara 11an de, bi navê Rezo hatiye weşandin.

3. (Finda şamal), bi navê Aro di hejmar 14an de hatiye weşandin.

4. (Qaziyê heqnas), di hejmara 42an de bi navê Rezoyê Osê hatiye weşandin.

5. (Keçên pîrê), di hejmara 40î de, bi navê Rezo hatiye weşandin.

Lêkolîn:

Çend lêkolînên wî yên zor hêja û nirxdar di Pirsê de hatine belavkirin, ew jî ev bûn:

1. (Firazyolociya Kurdî), lêkolîneke rêzmanî e zor hêja ye, di hejmar pêncan de, bi navê Rezo hatiye weşandin.

2. (Xwedîkirin û guhadana zarokan di civaka Kurdî ya kevin de). Di hejmara zokî 7/8an de, bi navê Rezo hatiye weşandin. Ew lêkolîneke zor hêja ye, tê de şewaza xwedîkirina jina Kurd ji zarokên xwe re diyar dike. Di beşê lêkolînê yê duyem de jî, fêrkirina Ehmedê Xanî ji zarokên Kurd re, wekî ku di pirtûka wî (Nûbuhara Biçûkan) de hatiye, bi şeweyekî rexneyî, nirxdarî, pir hêja û sûdar şirove dike. Bi rastî, dê pir hêja be, mirov her demekê li wê lêkolînê vegere û bixwîne.

3. Lêkolîneke fereh û zor hêja bi navê (xwendinek di berhemên Cegerxwîn de), bi navê Rezoyê Osê di hejmara 31/32an de hatiye weşandin. Ew lêkolîn li sala 2004an di konfiransekê de, li bajarê (Ezmîrê – Tirkîyê) hati bû girêdan de, hatiye xwendin. Tê de, bi nivîsîneke sade, zelal û ciwan, piraniya berhemên seydayê Cgerxwîn dane nasîn.

Helbest:

Tenê helbestek bi navnîşana (Kevoka Min), di hejmara duyem de, bi navê Rezo hatiye belavkirin. Mijara wê li ser cangoriyên Helebçe ye. Ew helbesteke zor şêrîn e, ew hestewariya xwe ya pir nazik, bi wêneyên zor ciwan û bi hikardarî diyar dike.

Werger:

Kek Rezo du çêrok û şanoyeke wergerandî, di kovarê de weşandine, ew jî ev in:

1. (Vê carê), kurteçêrok e, ji Erebbî hatiye wergerandin, ew bi navê Rezo, di hejmara çaran de hatiye weşandin.

2. (Mirina kew), şano ye, tirecîdiyek ji sê perda ye, ji Erebbî hatiye wergerandin, û bi navê Aro di hejmara dehan de hatiye weşandin.

3. (Hollê Xanim), çêrokeke zarokan e, ji zimanê Almanî hatiye wergerandin, û bi navê Aro di hjmara sêzdehan de hatiye weşandin.

Gotar:

Deh gotarên wî di kovara Pirsê de hatine weşandin, ew jî ev in:

1. (Nêzî nimêjê nebe) gotareke rexnegêrî ye, li ser nivîsarên wêjevanekî Kurd e, gotar bi navê Rezo di hejmara 14an de hatiye belavkirin.

2. (Kî berpirsyar e?) Gotareke zor hêja ye, li ser nivîskar, xwendevan û çapemeniya Kurdî ye, ew di hejmara panzdehan de bi navê Rezo hatiye weşandin.

3. (Rojnameya Kurdî nimûneya Sûriyê), gotareke zor hêja ye, li ser rewşa rojnamegeriya Kurdî li Sûriyê nivîsiye, ew di hejmara 16an de bi navê Rezo hatiye weşandin.

4. ((Hilweşandin)), gotareke rexneyî ye, mijara wê li ser têkiliya di navbera nivîskar û siyastvan de ye, ew jî bi navê Rezo di hejmara 17an de hatiye weşandin.

5. (Malî ava), deqeke wêjeyî ye gelek şêrîn û hestedar e, li ser nîrxên dostaniya resen û îjdlî hatiye nivîsandin, ew bi

navê Rezo di hejmara hejdehan de hatiye weşandin.

6. (Bandora Mîr Celadet Alî Bedirxan li Kurdên Binxetê). Ev gotar bi navê Rezoyê Osê di hejmara 22/23an de hatiye weşandin.

7. Pêşgotineke dirêj ji hemara Pirsê ya bîst û şeşan re, bi navê (rola xwêner), nivîsiye, û bi navê Rezo hatiye weşandin.

8. Gotareke ramanî û felsefî ye pir hêja bi navê (Kerşeytan) di hejmara 27an de, bi navê Rezo hatiye weşandin.

9. Pêşgotina hejmara 33/34an, wek gotarekê bi navê Aro nivîsiyê. Ew bi gotinên kin, lê bi wateyên kûr li ser sinciyên mirovê Kurd bi tevahî, û rewşenbîrên Kurd bi taybetî, axiviye.

10. Deqeke wêjeyî, bi navê (Palo rabe), di hejmara 35an de hatiye weşandin, ew mîna helbesteke pexşaneyî ye. Bi rastî jî, ew nivîs bi her tiştên xwe şêrîn, ciwan, hestedar û watedar e jî. Tê de bangê li helbestvanê Kurdê Mile Ehmedê Palo dike, û mizginiya azadî û serkeftina gelê Kurd digihîne giyanê wî yê pak.

Rêportac:

Bi tevahî, sê rêportacên Kek

Rezo di kovarê de hatine belavkirin:

1. Rûportacek bi navê Rezo, li (Yobîla zîvîn a bîst û pênc saliya goçkirina Mele Ehmedê Namî), di hejmar bîst û yekê de hatiye weşandin.

2. Rêportacek têrkirî li ser (Rojên wêjeyî li Diyarbekrê) ku li sala 2004an hati bûn li dar xistin, nivîsandi bû, û di hejmara 33/34an de hatiye weşandin, Kek Rezo bi xwe jî lê amade bû bû.

3. Li sala 2008an festivalek ji bo bîranîna Seydayê Cegerxwîn li Hewlêrê li dar keti bû, Kek Rezo di wê festîvalê de beşdar bû bû. Wî rêportacek têrkirî bi navê (Cegerxwîn -festival Hewlêrê) li ser wê mehrecanê nivîsandi bû, û di hejara 41an de hatiye weşandin.

Beşdarên berêz...

Ji nivîsarên Kek rezo, yên di kovara Pirsê de hatine weşandin, xuya dibe, ku ew bi dilsozî û zîrekî li ber pirsên gelê xwe rawstiyaye, pêûsa xwe li ber daniye, û mora xwe jî li rûpelên çanda Kurdî xistiye. Bi rastî, û bi şhadeta nivîskaran, bi taybetî jî bi şhadeta xwendevanan , Kek Rezo di hemî warên nivîsînê de, nivîskarekî gelek jêhatî û

serkeftî bû. Eger em taybetmendî û salixên nivîsarên wî bijmêrin, emê, bê erêna, kani bin van rastiyan bêjin:

1. Nivîsarên wî di hemî cureyên wêjeyê de hene, wî hemî war û mijarên jiyana gelê xwe dane ber xwe. Ew jî dest nîşan dike, ku çavên wî li her qunceki civakê bû, her tiştên civaka xwe bi çaveki vekirî û bi hişekî zelal didît, û bi nêrîneke zanistî, bi xemxwarî û rexneyî lê dinêrî, û herdem hewldida, da ku rewşa gelê xwe biguhêre û pêş de bibe.

2. Nivîsarên Kek Rezo ji aliyên rêzmên, hevoksazî, stîlê û ramanê de jî, di asteke bilind de ne. Gava mirov nivîsarên wî dixwîne, hîç li ber bêje û hevokên wî nasekine û lê venakulme. Wî herdem bêjeyên Kurdî yên resen, sade û zelal bi kar anîne. Em bawer dikin, kesine din, di temenê wî de, û ewqas li derveyî welêt ma bin,

dê bi hêsanî nikani bin Kurdîtiyeke ewqas zelal biparêzin. Loma jî, eger derfet peyda bibin, emê hewil bidin, nivîsarên Kek Rezo, yên ku di kovar a Pirsê de hatine weşandin, di hejmareke taybet de, yan jî di servehiyeke cida de, çap bikin. Belê Kek Rezo, Erê hevalê me yê hêja, mirovên mîna we, zû zû peyda nabin, û şûna wan bi hêsanî netê dagirtin, çima te ewqas lezand û tu çû? Te li pêş helbesta xwe, ev gotina ciwan û xemgîn li ser rêwîngiya giyanên pakrewanên Helebçe nivîsî bû, te wiha goti bû:

((Geşek kevok ji ser xaka Helbçe rabû, lê nema lûsa xwe dît.....)), ...Sed mixabin tu jî ji ser xaka Qamîşloya birîndar rabûyî, lê te lûsa xwe di nav rûpelên dîrokê de dît.

Dîsa bila serê me hemiyan xweş be. Ê spas ji bo we.

* * *

Komîta Kovarên Kurdî li Sûryê

Piştî gotina PIRSê, birêz Selah Beyro Gotina Komîta Kovarên Kurdî li Sûryê xwend, ev e deqa wê:

Nivîskar û rewşenbîrên Kurd ên hêja...

Malbata Buhuşti..

Amedebûyên rêzdar...

Em bi navê Komîta Kovarên Kurdî li Sûriyê, ya ku bira û hevkarê me Rezo yek ji endam û damezrênerê wê bû, di çil rojîya wî de, bi xem û kovan bi xêrhatina we dikin. Diyar e ku amadebûna we di vê ahengê de, rêzgirtin û wefadariya gelê me û rewşenbîrên wî ji Kek Rezo yê Osê re nîşan dide. Bêgoman e, ku çûna Kek Rezo û barkirina wî ya lezgîn ji nav me, ne tenê ji bo malbat û zarokên wî, lê belê ew ji çand û wêjeya Kurdî re bi tevayî ziyaneke mezin bû.

Xwişk û birayên birêz...

Li gor têkiliyên me bi mamoste Rezo re, ew mirovekî xwedî hestekî nazik û hilwesteke pîvayî bû, di hemî waran de xwediye rexnên avaker bû, herweha wî li ser xwe jî bi sîngeke fireh rexneyên dostan dipejirandin. Wî hevrikî û dijayetî bi tu kesî re ne dikir,

herdem ew xemxur û berketiyê çand û peyva Kurdî ya resen bû.

Belê kekê hêja, bi bawerî em dibêjin, bi çûna te, stêreke geş û ronak ji asîmanê çand û wêjeya Kurdî li Sûryê hilgûvî û hate xwar, giyanê te yê pak



Selah Beyro

bûye mêvanê karwanê wan mêrxas û mezinên me yên payebilind mîna Mîr Celadet Bedirxan, Dr.Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrî Can û Cegerxwîn...û hwd, ewên ku bi saya serê wan, em îro bi zimanê xwe yê şêrîn dixwînin û dinivîsin.

Beşdarên bi rûmet...

Di dîroka gelên cîhanê de, navê sembolan pîroz e, û ew bi tîpên zêrîn di eniya dîrokê de kûr tene nivîsandin, em bawer in ku navê Kek Rezo jî di dîroka wêje û toreya Kurdî de

dê bilind û bi rûmet bimîne. Belê, wê navê wî bimîne, ji ber ku wî karîbû di keş û hewayên awarte de, bervaniyeke bê tirs di ber ziman, çand û folklorê Kurdî de bikira. Tevî ew hemî rewşên aloz, girik û li hev ketî, her dem kul, derd û xema wî ya sereke ew bû, ku zimanê dayika

xwe hembêz bike, wî biparêze û pêş ve bibe!.

Em ji Xwedayê mezin tika dikin, ku cihê wî buhuşt be! Serê malbat, dost, heval û hogirên wî sax be!

Komîta Kovarên Kurdî
Li Sûryê ... 09/04/2010Z-
2621K

* * *

Gotina Samiyê Mela Ehmedê Namî

Pişt re, Mamoste Samiyê Mela Ehmedê Namî, xezûrê ciwanemerg Rezo gotinek xwend, ev e deqa wê:

êşa bê pîvan, dikir qîrîn û hawar, digel hewqas berxwedan û xurtbûna vîna wî.

Hawara Xweda bes e.. bes e.. bes e. Wek ko zimanê halê wî bibêje:

Ez recakar im ji te Xwedayê mezin bihnvedanekê bide min

Çilrojîya koça dawî ya Rezoyê Osê

Xwîşk û birayên delal, xemxwarên gorbuhuşt Rezoyê Osê.

Hûn bi xêr hatin.

Bi dilekî tijî kovan em çilrojîya Bavê Salar û Rolan bi bîr tînin, û vê ahenga bedew li dar dixînin.

Birêzan. Hûn tev dizanin ko penceşêra bê qudoş penc û kulabên xwe yê tund di can û cegerê Xwedê lê xweş be Rezo de şax da bû. Ji dijwarîya



Samiyê Mele Namî

da vî berê nîvco bibim serî, ew ber emanetêke mîletê min danîye ser milê min, da du malikên di helbesta xwe ya dawî de bihûnim. Da wekû du rezên ne nivîsî di gotara xwe ya dawî de binivîsim. Da ramanên xwe yên resen wek bîr û bawerîyên xwe bi qonax bikim. Da çavên xwe ji xweşî û rengîniya jiyane dagirim. Da xatir xwestinek dawî ji welat û mîletê xwe bixwazim.

Lê mixabin qîrîn û hawarên Rezo yê birîndar beyhode, bê ser û şop diçûn. Wek meteloka Kurdî dibêje: Xuya ye dilê Xwedê bi kesekî na şewite.

Rezo...

Bi aramî di gora xwe ya di pesarê girê gundê Dekşûriya xemgîn de raze, ew gundê ko tû bi hestên xwe yên tenik dilsojê wî bûyî.

Rezo...

Xweş bawer be hezkiriyên peyv û rewşenbîriya te. Nîgara te, Salar û Rolanê te, ko bi dilsojî te ji wan re digot : Bexên min, wê wan hêvî û daxwazên te, keser û omîdên te bi cî binin.

Şîn...Şîn...Şîn, îro şîn e, azmanê Cizîrê herweha gundê Dekşûriya Aşîta , kurdên te, rewşenbîriya kurdî, malbat û

dost û hevalên doza te reşa xwe girêdane û dibêjin:

Oxir be Rezo ...çiqas ev oxir bi min giran e. Lê çî bikim, va ye bûye rastîyek, çûna te xisaretek pir mizîn e Rezo, ji rewşenbîriya kurdî re, lê bizane emê her û her li ser te xemgîr bin. Ax... mala nexweşîya peçeşêrê û mirina bê bext ne ava be, ko destên kur û bavan, xwîşk û birayan, jin û mêran. Dost û hevalan ji hev diqetîn e.

Oxir be Rezo. Xwezî te carekê serê xwe bilind bikira û bidîta bê çawa bi hezaran welatparêz û hezkiriyên te beşdarî cenazê te bûbûn, tê bixwenda bê çiqas helbest, gotar û sersaxî di malperên enternête de hatine weşandin, bê çendî sersaxî ji malbata te re hatine, bê çawa çilrojîya te bi coş li Qamişlo, Dihokê, Stockholmê, Hanoverê û hin ciyên din wa bibîr tînin, bê çawa tilivizyonên Kurdistanê di nuçeyên xwe de bûyera koça te ya dawî di bernameyên xwe de diweşîn in. Bêgoman wî çaxî tûyî bi aramî serê xwe di gorê de deyne.

Rezo şagirtên te ko te ew fêrî xwendin û nivîsandina kurdî dikirin, peyv û hevoka kurdî jî

li ser vê çûna te ko ne di çaxê xwe de hafî, xembar in.

Rezo em xemgînên dilşikestîyê çûna te ya bê vejer in. Rolanê delalî dilê min xweş dikir, dema li ser gora te digrîm, wî jî bi giryan digot: Kalo, qurbano megrî dema tû digrî bavê min diqehere.

Erê Rolanê min, ez nema digrîm da ko bavê te bi xweşî di gora xwe de raze, lê bawer be ezê her û her bi girî û çavên ji fermîskan dagirtî bim.

Bo çi?!! Ji ber ko Rezo ne tenê zavayê me bû, lê belê ew ji malbata Samî yê Nami re kur bû, bira bû, hevaljiyana Nîgar bû, bavê Salar û Rolan bû. Wax û sed carî wax!!!!

Di dawiyê de sipasiya we teva dikim, bere serê miletê Kurd û serê we sax be.

Hêvîdar im ji Yezdanê pak û dilovan ko Rezo bi dilovanîya xwe şa bike.

De bere cîgehê Rezo bavê Salar û Rolan buhuşt be.

Qamişlo, 15/04/2010

* * *

Gotina dost, heval û hogirên Rezo

Birêz Konê Reş, gotina dost, heval û hogirên Rezo xwend, ev bû deqa wê:

Di 40 Rojîya Koçkirina Rezoyê Osê de

Bêguman bi koçkirina mamoste Rezoyê Osê re, aşîqekî ziman, folklor û peyva Kurdî a resen ji hespê xwe peya bû.. Rezo! Stûnek bingehîn bû ji rewşenbîriya Kurdî re li Rojava.. Bi saya wî rojnamegeriya Kurdî derbasî qunaxek nû bû. Dema ku wî û

hevalê xwe Zagrosê Haco di sala 1983 an de kovara Stêr bi rengekî nûjentir ji kovarên mayî



Konê Reş

wek Gulistan û Gelawêj çap û belav kirin..

Rezo hezkerekî folklorê Kurdî bû. Erê gelekî bi folklor ve girêdayî bû.. Berî mirina van dengbêjên Kurd yên gelêrî (Demir Elî, Silo Koro, Hizniyê Selîm..) wî hevpeyvînên bi deng û reng bi wan re saz kiribû û niha di ersîfê wî de ye.

Ew mîna şêxê rewşenbîrên Kurdan bû li Qamişlo, û di nav tevayî nivîskarên Binxetê de wek şêxê rewşenbîrên Kurdan dihat naskirin. Civîna rewşenbîrî ku ew ne di nav de ba, ew civîn seqet û ne cihê baweriyê dihat dîtin..

Her dem şagirtên wî hebûn, ew fêrî zimanê kurdî dikirin û gelek caran di buroya xwe de jî ew fêr dikirin.. Wek ku li berhemên dost û hevalên xwe guhdar û miqate bû, wiha li berhemên xwe ne miqate bû. Gelek caran min jê re digot; mamoste! Li berhemên xwe jî miqate be. Li min vedigerand û digot; Mamoste a giring em wan bixin bin bar de, em nav di wan de bidin, da ku xwendevanên zimanê kurdî çêbibin...

Ew mîna sembolekê bû ji zimanê kurdî re. Bi hebûna wî dîmenê rewşenbîriya kurdî a resen dihat parastin û avdan û di pileya pêşîn de ziman. Ji ber ku piraniya nivîskarên me berê xwe dane nivîsandina bi zimanê Erebî!

Erê, Qamişlo evîndarekî zimanê Kurdî wînda kir, belê bi saya keda wî û ew korsên ku wî ji şagirtan re vedikirin, roja îro bi hebûna wan şagirtan, ez bawerim wê dîmenên rewşenbîriya Kurdî li Binxetê xweş û geş bimîne.

Bela koçkirina wî ji rewşenbîrên Kurdan re mîna likumandina hespê be. Hêviyên me bi xortên me yên nûhatî mezin e, hêviyên me bi evîndarên zimanê me mezin e, û em xweş bawer in, ku ew xwe ji şop û rêbaza rehmetiyê Rezo nedin alî. Û wiha ez bawer im wê dîmenên rewşenbîriya kurdî a resen bê parastin û geş bimîne.

Spas ji hatin û beşdariya we tevan re, Hun tev sax bin di xweşyê de.

Qamişlo, 15/04/2010

* * *

Gotina Nîgara Samiyê Namî

Piştî gotina dost û hevalên Rezo, hevjîna wî, Nîgara Samiyê Namî gotinek bi sernava (Gotina min) xwend. Ev e deqa wê:

Gotina min

Di van 23 salên ku ez û Rezo weke mêr û jin bi hev re bûn, min ew ji xwe û zarokên xwe re weke bav, bira û heval didît. Bi dilxweşî me jiyana xwe ya rojane derbas dikir. Gelek tiştên ku me ji pêşeroja xwe û zarokên xwe re danîbûn ku em bikin, mixabin nexweşiya bê bext rê li ber me girt, û nehişt em wan hêviyan bi cî bînin.

Yek ji wan hêviyan, çapkirina berhemên wî bû, ya ku bûye cihê pirsê. Rastiya wê jî ev e:

Tim û tim wî dixwest wan ji kîsê xwe çap bike û ji bo çapkirinê xwe amade kiribû, lê weke me got, nexweşî û mirinê ne hiştin ew hêviyên xwe bi cî bîne. Digel ku 5 pirtûkên zarokan ku berî 15 salan hatibûn çapkirin, hîna li malê ne, li benda xwendevanan e.

Bi sedema ku Rezo evîndarê zimanê Kurdî bû, wilo jî

dixwest her kes xwe hînî vî zimanî bike. Dema ku nû em ghiştibûne hev, wî ji min pirsî: Gelo tu zanî bi Kurdî bixwînî?. Min di bersiva wî de erê got.



**Nîgar Xanim
Kebaniya Rezoyê Osê**

Wî bi lez û bez çend rûpelên çapkirî dane destê min û doza xwendina wan li min kir. Pişt re ji min pirsî: Te çawa dît?. Bersiva min: Ev bi xwe rêziman e, ji hînbûna wê re, mamostayek gerek e. Wî got: Na, divabî tu xwe bi xwe fêr bikî.

Dema bû çaxê herdu zarokên me, careke din min ew doz lê kir, dîsa wî got: Bizane bê çawa min xwe bi xwe fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî kiriye, bera ew jî weke min bikin, li gora vê xwestekê, zarokan jî xwe fêr kirin, lê dema pirsên wan li ser

ziman hebûna, hingî rastiya wan
ji bavê xwe digirtin.

Di dawiyê de, ez bi hêvî me
ku Rezo di bîr û baweriya

rewşenbîriya Kurdî de zindî
bimîne, û gelek sipas.

Qamişlo 12/04/2010Z

* * *

Gotina Malbata OSÊ

Li dawiyê, li ser navê
malbatê, Dr.Memo Ebdî gotinek
xwend, ev e deqa wê:

Gelî dost û hogiran
Mêvanên birêz

Bê guman tekoşerekî bi
qama Rezoyê osê ko heyran û
tagirê zimanê dayikê yê şêrîn
bû, sembola ronakbîrên afrîner î
hemdem bû . gengaze keda wî
bertelef neçê û li erdê nemîne.
Erê gewde û laşê wî ji nav me
barkirin. Lê bandora raman û
hizrên wî wê bimînin
demdirêjane .

Çiqas di nivîsên xwe de xwedî
pênûseka bi hêz û li ser xwe
sekinî bû, hostayê avekirina
hevoka bi kurdî bû. Di baweriya
min de kesê ko rehmetî
nasdikirin, û mîna ko we jî anî
ziman û hemîbeşdarên çilrojîya
wê hemfîkrin di vir de, ew ne
pesn û fort in , lê rastiyeke
gorbuhuştî Bavê Salar bû, ko
wîna rojekê ji rojan dijî bîr û

baweriyên xwe şabaşên erzan
nedane, di hemî qûnaxên jiyana
xwe de û hemî berjewendên
teng dervî girêdana wî bi ziman,
rewşenbîriya rasteqîn û afrîner
neparastiye, ev jî dost û
dijminên wî vê rastiye dizanin û
kes nikare vîna nepejirîne, ji
lewre pênûsa wî rêzgirt bû, cihê
baweriyê nehej û berpirsiyar
di nav hemî kesayetiyên
rewşenbîr de, sazî û ta tevgerên
siyasî de, ji xwe di warê
vexîneya wî ya çandewarî de
hedeke mezin daye, ta gihîştîye
vê ast û radeya bilind ko girînge
em guhbidin nuvîsên wî yên bi
ziman û naveroka xwe
berhemine dewlemend in,
xwedî sûd û qizincên nebûyî
ne.

Bavê Salar yek ji pirên
zimanweriyê ne, ji qonaxên
hawar û mîrê nivîsandina bi
kurdî Celadet Alî bedirxan ta
serdema iroyîn , rexnenûsên wî
li hemê berhemên ko bi kurdî

derkrin û diketine nav destên wî de, nixandineke pisporeneyî bilind didîtin. çavkaniyeke tije cewherên diberiqênin û nirxbuhane.

Yek ji behane û palpiştên ko vê gotinê didirikêne ew lêkolîna ko bi navê uzunname ko di kovara dugurê de derketibû şahid û piştrastkirineke ji vê zîrekiya wî re ya ko bi xwe rexnelêkolîneke li ser romana TU ya romanûsê kurdî Mehmet Uzun e, dîsa hûrkoêvîna wî ya li ser perwerdekirina zarokên kurdan û şirovekirina Nûbihara Xanî heman pisporiyê eşkere dike. Fêrkirina wî ji komelrîyên xort û qîzên nûhatî re zimanê kurdî û hezkirin û evîna ko dikire filên wan de bi rewanekî şoreşgêrane xislet û taybetmendiyên bêhempa yên Rezoyê gorbuhuşt bûn komkirin û berevkirina wî ji zargotin, pend , şiretên kurdî yên resen derd û xemên wî bûn û tim û tim li bîra wî bûn .

Bi kurtahî ev in xalên bingehîn û pîroz di kesatiya Rezoyê Osê de.

Di warê têkiliyên civakî nefsbîçûk bû, kîn, zikreşî, xêrnexwazî û çavnebarî di ferhenga wî de cihê xwe ne didîtin. Lê qederê zû ew ji me

dizî û zimanê kurdî dîsan seqet kir.

Bi ya min tiştê giring ko rezo mezin kir hezkirina ji welat û milletê xweyî hejar û reben re bû, ko xêrnexwazan ew kiriye parçe parçe û dijhev bikaranîne, hezkirina wî ji merovan re û girêdana wî bi xak, çiya deşt û newalên xwe ve bû . li vir ezê vehesînim û van gotinên seydayê tîrêj ko li bejin û bala rehmetî tên, diyarî rewanê wî yî pîroz bikim.

Ey welatê can bi gorî
gazina te ji min nebê
Tu dizanî bi şev û roj
ez jî xemxwarê te me
Ger hemî kes aşiqê malê
dinê û çavên reş in
Ez evîndarê çiya
û deşt û zozanê te me

Rezoyê osê nimûneke ji hezkirin, canfîdayîya rewşenbîran e , ko pîraliyane dixebitî û tekoşîn dikir. Pirsên mîna çima kurd bê xwedî ne , em çima ne hevsojên hev in , çi ji me kême ko di nav malbata cîhan şaristane de , ne xwedî nav û ziman û al bin. Bi vê helwestê xwe dikir rêza Xanî û Cegerxîn de. Bersivan heman pirsê dide ev pîrsa ko Ehmedê Xanî kiriye ji xwedê:

**Aya bi çi wechê em mane mehrûm
Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm**

Bi navê malbata Rezoyê Osê, em spasdariya xwe ji hemî kesayetî, rewşenbîr, komele, dezgehên rewşenbîrî û civakî û partiyên siyasî li hundir û dervê welêt ko bi windabûna giran li aliyê me sekinîne, êş û xemgînî bi me re hevpar kirine ,yên ko di qonaxa nexweşiya wî ya giran de destê alîkariyê ji me re dirêjkirine, û piştî binaxkirina wî jî bi erk û dalemetên xwe rabûne û ti kêmasî nekirine. Çi kesê birûskname, behîname li ser navê malbatê rêkirine, em hezkirina xwe ji wan re didine xuyakirin, û em dibêjin win bi hezkirina xwe ya bêsînor ji rehmetî re wefadar bûn, û deynekî mezin û giran kire sukra me.

Ez dixwazim we agahdar bikim ko çilrojîya wî li pir cîh û waran ji hêla dost û hezkerên wî ve tê lidarxistin, ko me neçar dike slavên germ û spasnameyên kurdewariyê ji wan re bişînin. Dilxweşiyeke taybet girt ser hest û nestên me katê Roj TV bernameyeke zindî be boney koçkirina dawî ya gorbuhuşt li dar xist.

Di dawî de, em spasiyên xwe yê taybet ji kovara PIRSê re rêdikin ko ev civata rêkûpêk kiriye.

Bila pênûsa bi kurdî
Pisporane Watedar Û Bi hêz be.
Li ser navê malbata
REZOYÊ OSÊ,

Qamişlo 15 nîsana 2010 an

* * * * *



* * * * *

Birusk

Sê birûsk ji derveyî welêt gihîştin civata Çelrojê, ew jî ev bûn:

(1)

Malbata REZOYÊ OSÊ !

Malbata Samiyê Namî!

Rewşenbîr, dost û hevalên
REZO!

Bi xemgînî me bûyera koça
dawîn a nivîskar û helbestvanê
Kurd RezoYê Osê bihîst.

Mamoste Rezo bi helbest,
gotar, lêkolîn û rexneyên
avakirin û dewlemendkirina
çanda Kurdî hatibû nasîn.

Rezo xwediyê xameya çalak
bû, zimanzanekî têgihîştî bû,
helbestvanekî hest nazik bû û
rexnevanekî rastgo bû.

Ew bi hevalên xwe re
dilovan, rast û dilpaqij bû, lê
mixabin zû ji nava refê xwe,

bêyî ku rêça xwe bibe serî bar
kir.

Ez bi navê Komeleya
Nivîskarên Kurd li Swêdê,
sersaxiyê ji gelê Kurd, malbat,
rewşenbîr û dost û hevalên
REZO re dixwazim.

Bila ev dilêşî û keserên we
yên dawî bin, ji Yezdanê mezin
hêvîdar im ku cîgehê REZO di
baxekî ji baxên buhuşta rengîn
de be.

Zinar Soran..

Serokê Komeleya Nivîskarên

Kurd li Swêdê

Stockholm 2010/04/15

(2)

Malbata rewşenbîr û
nivîskarê Kurd Rezoyê Osê

Kovara PIRS

Beşdarên rêzdar...

Di ahenga çilrojîya kek Rezo de, bi navê desteya birêvebir a Kovara AL-Hîwar, em xemgîniya xwe tînin zimên, hêvîdar in ku cihê wî buhuşt be û hêminî û aramî têkeve dilê endamên malbatê.

Bêgoman e ku koçkirina birêz Rezo, ji çand û toreya Kurdî û wergera zimanê Erebbî re ziyneke mezin bû.

Careke din serê we himiyan sax be!

Desteya Kovara

AL Hîwar

14/04/2010Z

(3)

Birûsk ji Ahenga Çilrojîya Rezoyê Osê re

Bi helkeftina çilrojîya Koçkirina nivîskar û helbestvanê Kurd ê hêja Rezoê Osê, ez serxweşîya malbat, dost û hevalên wî dikim, hêvîdar im ku cihê wî buhuşt be.

Rezo, di asîmanê toreya Kudî de, stêreke geş bû, her û her dê navê wî di jiyana Kurdewarî û wêjevaniyê de ronîdar bimîne.

Careke din serê we hemiyan sax be!

Nazlî Xelîl (Diya Fuad)

Stockholm-Swêd...

11/03/2010

* * *

❖ Nivîsarên li ahenga Çelrojê ne hatin xwendin

Ji ber rewşa dijwar a ku boneya çelrojiya ciwanemergê hêja Rezoyê Osê tê de li darket, jixwe dema wê jî pir kin bû, gelek nivîs, gotar û helbestên ku ji hêla gelek dost û hevalên wî de ji bona wê boneyê hati bûn amadekirin, ne hatin xwendin.

Emê nivîsarên ku li şeva boneyê amade bû bûn û ne hatin xwendin, û yên ku paşê jî gihîştin desteya birêvebrina kovarê, mîna ku hatine, li jêr dînin:

Gotar, lêkolîn, pexsan

REZO ZINDÎ YE!

Nivîs: Dilovan

Çekdarê bi pênuş li çar alî te
şer kir

Çil salî te şer kir

Cenga te bi demê re, şevên
tarî bi me geş kir

Suhbet bi me xweş kir

Çûna te kirin sêwî, ez û
pênuş û kaxet

Heyber û babet

Helbest jî weke min tevî
çûne helaket

Kovaran xwe zer kir

REZO tu hebî ta ku hebî
xame û dîwan

Bagok û Zozan

Ma bes kirî te qîr û nivîsîn û
mitalan

Ma kê go te bes kir?!....

Xwişka Nîgar, Malbata
Osê û malbata Namî: Serê we
sax be û serê hemû kesên
rewşenbîr, nivîskar, xebatkar û
miletperweran sax be.

Gelek dibêjin ku meha
Avdarê ji Kurdan re mangeke

taybetî ye, meha kul û derda ye. Lê ez dibêjim ger tu dîroka Kurdan vepexilînî, tu ti roj, an meh û salên taybet tê de nebînî, çiku dîroka me hemû kovan, kul û kesr in!, bi sedan bûyerên kuştin û qirkirinê ne. Bi rast û durustî, em miletekî bi derdan ferman pê dayî ne. Li hember vê yekê jî, emê weke Dicle û Ferat, weke Sîpanê Xelatê, xebat û kêferata xwe berdewam bikin.

Piştî vegera wî ji Ewropa, min Rezo nas kir û me bi hev re karê rêzanî û wêjeyî kir, lê min dît ku vî hevalî pir xwe bi zimanê Kurdî yê zikmakî de mijûl kiriye û westandîye, ji ser heya piyan bi ronahiya tîpên Kurdî veketî ye û pertewa folklor û kelepûra Kurdî bûye sîwaneke qeşeng û xwe li dora wî girtiye. Ji layekî din ve jî, min baş zanîbû ku ew bi her sê hevalên xwe re Dr.Sededîn Mela, Dr.Mihemed Ebdo Necarî û Bavê Nazê yek ji damezrênerê /Hevbenda Kawa/ ye, ku li Moskoyê vemizt û jimareke zor giring ji pirtûkan bi zimanê Erebbî, çî wergerandin û çî

afirandin, çap kirine û weşandine. Nivîskar Bavê Nazê timî digot:"Heger ne REZO bûya, wê hevbenda Kawa ne bûya!". Vê gişî, ez berew vî hevalî mîna kankêşê kişandim, weke çira û perperîkê û bandoreke mezin li min kir, û ez kirim dilbijokê vî kar û barî.

Piştî deranîna belavoka RONAKBÎR bi salekê /1981/, ku destên Rezo ew dixemilandin û bi alîkariya Partiyê (P.H.G.K) derdiket, Rezo û hevalê xwe Bilûrvan (Z.H) destên xwe vemaltin û Kovara STÊR damezirandin, jimara yekê di bihara sala 1983an de derket, di payiza wê salê de ez jî tevî wan bûm û komîta wê bûne sê diguhert da ku ew dubare ne be, an kes ne tewaw bêje kes. Di wê demê de, gotar û babetên ku ji me re dihatin pir hindik bûn, lê me bi nivîs û babetên xwe wilo kovar fikir, me navên xwe sê kesan ev kovar ji xwe re saman kirine. Ji ber, me her yekê du nav yan sê navên xwe yên nepenî hebûn:Rezo-Aro, Bilûrvan-Xembar, Dilvan-

Diljar. Timî Rezo karîbû wê valahiyê dagire.

Tê bîra min, şevê me karê xwe ji bo amadekirina hejmareke kovara Stêrê dikir, lê mijarên me kêmbûn.

-Rezo got: Emê çawa bikin seyda?

-Ez dibêjim bi wan herdu babetên te dê hejmar tewaw bibel!

-Û nav?

-Bike sê nav, çar nav. Ma em çi bikin?

-Ka navekî ji min re bibijêre.

-Ev pir hêsan e, ew Xembar û Bilûrvan û ez Diljar û Dilo van û tu Rezo û Aro û Kovan, nemaze ku Kovan di demekê de, ji bilî ku em giş bi kovan in, navê Berzaniyê Nemir bû, ...û wilo bû.

STÊRÊ ta jimara 21an sala 1992an berdewam kir. Roja 27/09/1992 komcivînek ji berpirsyarên sê kovaran re li dar ket (STÊR, GELAWÊJ û RÊ), biryar dan ku her sê kovar rawestî û li şûna wan yek kovar bi navê PIRS derkeve. Ji bal kovara Stêrê ez û Rezo bûn. Jimara yekê ji PIRSê di

Newroza sala 1993an de derket û ta niha ew berdewam dike.

Berî PIRS û STÊRÊ, dema ku ew li derveyê welêt bû, li Berlîna rojava, ji sala 1972an ve, Rezo bû yek ji damezrênerên kovara ŞOREŞGER, û bi alîkariya wî çend pirtûkên hêja çap bûne. Li Mosko jî vê xebata xwe berdewam dike, korsên fêrkirina zimanê Kurdî vedike.

Rezo, bi vîneke xurt û rakeşeke qewîn folklor û kelepûra Kurdî hembêz kir, nemaze di warê çîrok û çîvanokên zarokan de, bi dehan berhemên wî di kovar, belavok û rojnameyan de belav bûne, ji bilî 5 pirtûkan ku çap bûne. Sala 1991-2005 bi sernavê (Çîrokên Kurdî Gelêrî yên zarokan), di her pirtûkekê de 4 çîrok hene (Dîk-Dîko, Libhinarê, Bavê Hepûnê, Şengê û Pengê, Finda Şemal), Dr.Mihemed Ebdo Necarî û Şêx Ehmed Al Huseynî wergerandin zimanê Erebî.

Ji bilî ku tabetiyeke Rezo di warê ziman û rêzimana Kurdî de hebû, ew jîr û jêhatî bû,

herweha ew di gerdeka (meydana) analîz, lêkolîn, rexne û wergerandinê ji Almanî, Rûsî û Erebî de jî xwedî berhemine hêja bû. Sed mixabin ku berî nexweşiyê, pirtûka Donkîşot ya nivîskarê hêja Sêrvantis werdigerand zimanê Kurdî, lê belê êşa giran a malmîrat rê neda ku ew armanca xwe bibe serî û pêkbîne.

Berî dawî, divê em bizanin ku Rezo di deryaya Helbestê de jî avjenî kiriye, bi zimanê Kurdî û Erebî helbest ristine, helbesteke wî ya bi zimanê Erebî pir hêja û ciwan li ser bûyerên 12ê Avdarê heye.

Belê Rezo, di goristana pakrewanên welatê xwe de raze, tu sax î, tu zindî yî, ji ber ku yên jiyana xwe di xebatê de derbas dikin, ew na mirin. Belê, yasaya jiyane wiha ye, zayîn û mirin e, lê ew kesê ku ji bo pirs, derd û êşekên gelê xwe têkoşînê bike, ew namire, her ew di hiş û dilê gelê xwe de zindî dimîne.

Belê Rezo, bi xêra te, xwîn di tamarên peyva Kurdî de bi germî diherikî, bi xêra te, ewrên

reş û tarî di asîmanê wêjeya Kurdî de diferikî, di şevên tarî de, di zêrzmînên(qebû) teng û şilo- pilo de, bi tiliyên te, gelek mûm û find vêketine û di nav çeplên qirêj û çavsoriyê de, tûjandin û tewanbariyê de te kar û xabata xwe berdewam dikir.

Belê Rezo, hîn zû bû, her kevirekî vê herêma me ya bîndest, gelek çîrokên dilêş û bûyerên xemgîn di bin de ne, ew li benda te bûn da tu li wan guhdariyê bikî!! Hîn rûpelên kovara Stêrê ziwa ne bûne, hîn kovara Pirsê dike hawar û gazî!! Hîn nû tu gîhabû çax û baxên xwe!!

Peymana me bi te re ku emê berdewam bikin û vê rêya tev rêl û kelem bernadin, û wê projeya te here serî.

11/04/2010Z

* * *

Rezoyê Osê

Kurdîzan , Ronakbîr Û Folklornas

Nivîs: Berzo

Pêşekî

Miletên cîhanê her yek bi ziman û wêje û rewşenbîriya xwe tê naskirin û tê cudakirin, lewre jî em dibêjin wêjeya Ingilîzî, yan ya Frensî, yan ya Erebî yan ya Turkîtad. wilo jî em gava navê Şakispîr tînin ziman şanoya Hamlêt yan Romiyo Colliyêt tê bîra mirov. Wilo jî gava em diçine nav wêjeya Erebî, navê hin nivîser û biwêjên bilîmet tê bîra me, wek Nîzar Qebanî, Necîb Mehfûz , û gelekên dîtir. Wusa jî Nazim Hikmet û Ezîz nesîn di wêje û keltûra Turkî de tê bîra me. Helbet li nik Kurdan jî mirovên wek Ehmedê Xanî û Cizîrî û Nalî û Cegerxwîn û Şêrko Bêkes û Bedîrxanî jî tînin bîra me. Inca em dixwazin wê yekê bêjin, ku hin mirovine behrewer ev wêje drust kirine, ne ku ji xwe re şîn hatiye, her divê kesin vî tovê han li vê zeviyê

bireşênin da ku şîn were. Em dixwazin bigihên wê yekê ku rewşenbîrên miletan di avûhewayeke xweş de hîmê

wêje û kelepore xwe danîne, û bi berhemên van mirovan ala wêjeya xwe bilind kiriye, û hatiye naskirin, ango mirov xwe bi xwe nasnameya xwe çê dike. Ji ber vê yekê em li vir kom bûne ku em ne tenê qedir û qîmetekî bidin mirovekî ku jiyana xwe hemî terxan kiribû bo vê dozê, lê belê bo ku em îro roniyê bavêjin ser wan berhemên ku vî camêrî bo me gihandiye.

Rola ziman di avakirina berhemên wêje de gelek giring e, nemaze di danîna helbest, çîrok, Roman, şano, gotar û nivîsar û di hemî aliyê zanyarî û jiyanê de. Mirov di riya ziman re danûstandinê bi xelkê re drust dike, di riya ziman re em helbestan ji çîrokan cuda dikin,

ku ew jî awayê hûnandinê ye, awayê teknîk û endezeyariya nivîsînê ye, ya ku van berheman ava dike. Ji ber ku têkist çî helbestî be û çî çîrokbêjî be, û çî şanogerî be, her endeze û teknîka ziman û pêkhênerên binyatgerî yên berhemên wêje ew e, ku nivîser pêve girê dide. Ya dîtir jî Çawa nîgarkêş rengan bi awakî taybetî bikar tîne ku karîgerî û kartêkirinekê li nik xwêner drust bike, wilo jî nivîser di hemî buwarên wêje û nivîsînê de hewl dide ku têkista xwe bi zimanekî rewan û pakij û sazkar bihûne ku xwendevan bi ser xwe de bikêşene. Helbet ev ziman, ango xurtiya zimanê wêje li ser hin hîmên serekî radiweste, ku ew jî ev in:

1. Ristesazî hûnandina kurdî ye di binyata ristê de, û dûtir ji awayên zimanên biyanî, nemaze yê Erebi sebarek kurdên Sûrî.
2. Peyvnasî zengîniya peyvên kurdî ye, bi taybetî di zarê kurmancî de.
3. Idyîm.
4. Kelepor wekû dewlemendî û saman.

5. Nûjenî bi awakî zanyarî.

Berî her tiştî em hatine vê civatê bi mebest û hêvîya ku em bikarin fîndekê pêbixin, û roniyê bavêjin ser kar û xebata mirovekî ku temenê xwe di xizmeta ziman û wêjeya xwe de bûrandiye. Wek têbîniyekê jî hate bîra min, dixwazim vê yekê di vê helkeftinê de aşkere bikim: Em wek nivîser û rewşenbîr li ser berhemên hevalê xwe ranawestîna ta ku ji nav me bar dike, ji nû em bi lez û bez tene li nivîsarên wî digerin, û ji nû ve dixwênin. Ez vê yekê dibêjim û ez berî herkesî rexnê li xwe digirim, ku wek min piştî çûna Rezo, ez li berhemên wî ji nû vegeriyam, ne ku min berê nexwendibû, lê ew xwendina minî berê li dema ku ew bi me re bû xwendineke serasera bû. Xaleke dîtirî balkêş heye, ew jî ew e: Dema em berhemên hevdû dinerixênin, em tenê xirabiya dibînin, em başiya nabînin, lê di mirinê de em başiya tenê dibêjin. Ez dixwazim bêjim, ku ya pêwîst em başiya nivîsînê û berheman di jîyan û saxiyê de bibînin, û

bêjin û li ser binivîsînin. Nizanim sakolojiya me kurd vê yekê wilo dike yan ev tiştêkî sruştî ye?

Kak Rezo yek ji wan xemxwarê ziman û wêjeya Kurdî bû, û her dem amade bû ku demeke bêsinor di vî warî de baxêve, û bîr û baweriyên xwe tê de ronî bike bi mebesta geşekirina pêta keltora Kurdî. Rezo yek ji wan kesan bû, ku hiş û sewdanê wî pirtir di yek xelekê de digeriye, ku ew jî warê nivîsîn û axaftin û bizava rewşenbîriya Kurdî bû, û rojekê jî xwe ji vê xebatê dûr nekiriye, çendî ku barê jiyanê giran e, û mirov naçar e guh bide mala xwe.

Kak Rezo di **zarê kurmancî** de bi awakî serekî ji xwe re samanekî rengîn ji zimanê kurmanciya resen ya ku ji folklor derdikeve ava kiribû, û tê de zîrek û pehlewaneke bêrawestan bû, û te çilo tavêt ser lingê xwe disekinî. Rezo ji wan kesên ku ji xwe bawermend û xudan nerîn bû, li xwe nediniha bîr û rayên nivîserên dîtir bixê ya xwe, yan

xwe bavêjê ser hespê xelkê, Rezo herçende raya xwe bi degelî digot, çî rast çî şaş, lê hin car jî li nerînên xwe yê kevin vedigeriya, û li şaşiyên xwe mikur dihat û pêre dikenî. Ev rûçik bi xwe cihê rêzgirtinê ye, û rê li pêşiya mirovê xwenda hem fere dike, û hem jî rastî jê re nêzîk dibe.

Di baweriyaya min de, **hezkirin û evînî** yek ji palnerên herî giring e bo pêşxistina mirov di warekî ji warên zanyarî de. Zanabûna mirovan di ziman de herçende ji dû xwendin û lêgeran û bizavê tê, lê ya herî xurt tê de ew semax û hedara mirov e, ku li ser vê rêçê berdewam be, bi armanca hem xwe pêşve bixe, hem jî xwendevanê xwe jî bi xwe re pêşbixe ku berhemekî nû û hêja bide. Kak Rezo jî di vê çarçoveyê de xwe didît, û jiyana xwe ya rojane jî xistibû gorî vê rêçê. Rezo dikarî bi hesanî bikeve warekî dîtir de, lê vîn û agirê evîna ziman di dilê wî de herdem gur dibû, û nedihîşt jê dûr bibe.

I- Kurtenasnameya Rezo

Di vê peregrafê de, emê bi kurtî tevger û xebata Rezo bidin xuya kirin wek çawa wî ji min re da xuyakirin, û wek nasname wî bi destê xwe nivîsandiye. Berî ku nexweş bikeve bi demekê, min ji kak Rezo xwest ku kurte nasnameya xwe bide min, hem ji ber pêwendiyên dostaniya di navbera me de, û hem jî hevaltîya karê nivîsînê di govara Pirsê de. Ya dîtir, ji ber hin goşe di jiyana kek Rezo de hene, ez pê ne agadar bûm, lewre min pêwîst dît ku ez vê nasnameyê wek çawa heye ez belav bikim.

Navê wî Ebdulrezaqê Eliyê Îsayê Osê ye . Roja 10.10.1950 li gundê Dekşûrî, Cizîrê, parêzgeha Hisiça, herêma Qamişlo hatiye jiyane. Xwendina xwe ya seretayî li gundê Tenûrî, sînardarê Dekşûrî, kuta kiriye, ya navendî û lîse jî li bajarê Qamişlo bi dest xistine.

Bi navên: Aro, Rezo, Stêr, Azad, Pirs, Ebdulrezaq Osê û Rezoyê Osê di gelek kovar û rojnaman de nivîsiye, wilo jî

di malperan de, ji wan : Stêr, Armanc, Dugir, Pirs, Metîn, Dengê Azadî, Zanîn....

Ji havîna sala 1970 de dest bi nivîsandinê kiriye. Gelek gotar û lêkolîn belav kirine. Wilo jî, helbesta kevneşop û nûjen nivîsiye, şano di kovaran de belav kirine, folklor daye hev û belav kiriye, kurteçîrok nivîsîne, çîrokên zarokan dane hev û pênc pirtûk bi navê **Dîk-Dîko, Libhinarê, Bavê Hepûn, Şengê û Pengê, Fînda Şemal** çap kirine. Wî bi Kurdî nivîsîne û Dr.Mihemed Nejarî guhertine zimanê Erebî, û bi hev re di bin navê danehev û pêşkêşkirina herdu navan hatine çapkirin.

Bi kurtî:

1. 1972 - 1974 Endamê komîta berpirsiyariya kovara "Şoreşgêr", ko li bajarê Berlîna Rojava derdiçû, bû.

2. Di van salan de jî bûye endamê komîta çapderîn, ko sê pirtûk li Berlîna Rojava çap kirin: Dîwana S.Hêzanî, bi Kurdî. Helperkên Kurdî, yên folklorî, bi zimanê Elemanî. Miletêk berxwedanê di ber

hebûna xwe de dike, bi zimanê Elemanî.

3. 1977 kursê fêrbûna zimanê Kurdî li bajarê Mosko, ji grûpek xortên Kurd / yên zanîngehê / re vekiriye.

4. 1977 Bûye endamê komcivîna damezrandina "Hevbenda Kawa bo wêjeya Kurdî" / dameznerên vê hevbendê : Bavê Nazê, Dr.Mihemed E. Najarî; Dr. Sedidî Mulla û Rezo bûn / ko li Mosko pêk hat. Vê hevbendê gelek pirtûk bi zimanê Erebî, çî wergerandin, çî jî afirandin, dane weşandin.

5. 1978 – 1980 Bûye endamê "komîta amadekar" bo pêkanîna yekbûna komeleyên xwendevanên Kurd li Ewropa, ko di bin çavnehîriya mamoste Ezîz Mihemed de kar dikir.

6. 1980 – 1981 Berpirsiyariya belavoka "Ronakbîr" li Sûriya kiriye.

7. 1982 – 1984 Bi Bilûrvan re serkêşiya fêrbûna "Kursên zimanê Kurdî" li binekova Cizîrê kiriye.

8. 1983 – 1993 Berpirsiyariya kovara "Stêr", bi Bilûrvan re, weku damezrêner , paşê bi Dilovan û hin rewşenbîrên din re kiriye.

9. 1993 - ... Endamê komîta berpirsiyar e di kovara "Pirs" de.

10. 2002 - ... Endam û yek ji damezrênerên " Komîta xelata Cegerxwîn" e.

11. 2003 - ... Bûye endamê komîta şewirdarên kovara "Pêl" ko li Elmaniya der tê. Vê salê jî bûye endamê "PENa" Kurd.

12. 2003 – Vexwendî çalakiyên sedsaliya Cegerxwîn, li Amedê û Izmîrê bûye. Li wir " Xwendinek di berhemên Cegerxwîn de" pêşkêş kiriye.

13. 2004 – Endam û çalakdarê komcivîna duwemîn ya "rojên wêjeyê li Amedê" bûye û beşdarî kiriye.

14. 2005 – Endamê konferansa PENa Kurd û PENa Tirk bû, ko di bin çavdêriya PENa Navnetewî û UNESCO de li Amedê pêk hat.

15. 2005 – Vexwendiyê festîvala rewşenbîrî ya yekemîn li Duhokê bû, da lîkolînekê li ser " hevoksaziya Kurdî " pêşkêş bike . Lê ji ber sedemên rewşa navwelatî / di navbera Sûriya û Îraqê de/ nîkarîbû amade bibe,tenha lêkolîna xwe rê kir.

16. 2006 - Endam û çalakdarê festîvala rewşenbîrî ya duhemîn li Duhokê bû.

17. 2008- Endamê festîvala Cegerxwîn li Hewlêrê bû.

II- Xebata Rezo di Rojnamegeriya Kurdî de

Ev bû nêzîkî hijde salan e, ku ez Rezo ji nêzîk ve nas dikim, û pêwendiyên min pê re di coka rojnamegeriya Kurdî de durust bûn, û di coka rewşenbîriyê de berdewam kir, ta ku canê xwe siparte Xudayê Mezin. Me gelek dem pev re bûrand, çi di karê govara Pirsê de, û çi jî di civatên dervî Pirsê de, ku pîraniya van civatan peyv û axaftinên me, yan di buwara ziman de bû, yan jî derbarî wêje û rewşenbîriya Kurdî de bû.

Rezo yek ji çend rewşenbîrên Kurd yên pêşeng in di tevgera xwendin û nivîsîn bi zimanê Kurdî de, ku govara Stêr wek ez dizanim li ser destê Rezo û Zagrosê Haco hate damezrandin, û bîst jimar belav kirin. Ji ber parçebûna partiya Hevgirtina Gel ya ku li pê Stêrê bû, Rezo dev jê berda û kete nav karwanekî nû de, ku ew jî du Gelawêj û Stêr û Rê û hemiya pev re govareke nû derxistin, ku navê wê jî kirin (Pirs). Rezo xebata xwe di Pirsê berdewam kir ta ku nexweşiyê, mixabin, ew ji nav me revand.

Rezo yek ji wan nivîser û zimanzanên Kurd yên ku roleke girinîg û hêja di nivîsîna zimanê Kurdî de leyist, û berhemekî gelek xweş ji têkistên Kurdî belav kirin, û pênûsa xwe ya zêrîn di gelek nivîsîn û berheman de bikartanî: kurteçîrok û helbest û gotar û wergêran û pêşgotin ji bilî serastkirina nivîsarên derve yên ku ji govarê re dihatin bo belavkirinê. Rezo ticarî çavê wî ji kar ne dişkest, herdem jê re amade bû, vê yekê giyanê

hevalan dilivand û ew geş dikirin. Helbet hevalên dîtir jî hemî bi wê cansivkahiye karê xwe dibirin serî. Ya dîtir eger em govara Pirsê bidin ber govarên Kurdî yên dîtir, Pirs yekemîn govar e di astê nivîsînê de di nav Kurdên Sûriyê de. Ez vê yekê dibêjim ji ber ku rastiyeke berçav e, lê ne ku kêmasî û şaşiyên wê nînin.

III - Rezo wek folkilornas

Mamoste Rezo yek ji wan kesê ku gelek dem daye xwendin û nivîsîn û komkirina folkilorê Kurdî, ji ber wilo jî çend çîrok ji têkistên folkilorê Kurdî li gel wergêrana wan bi zimanê Erebi jî aliyê Dr. M. Nejarî ve belav kirin. Navê van pirtûkan ev in: Dîk-Dîko; Libhinarê, Bavê Hepûn, Şengê û Pengê, Finda Şemal. Rezo ne tenê wilo jî, hin babetên folkilor dane ber lêkolînê, û pênuşa xwe di vî warî de baş mandû kiriye, ku ew jî di rojên bê de, em bihêvî ne bêne çapkirin.

IV - Rezo wek Kurdîzan

Dema em têkistên Rezo dixwênin, hin taybetiyên balkêş

di şewaz û avahiya zimanê kurmanciya berhemên wî de diyar dibin, ew jî ev in:

1. Resenayefî wek taybetiyeke zimanvanî di tevna ziman de diyar e, ku riste bi şeweyekî kurdane avahiya xwe werdigire, dûr ji kartêkirinên avahiya zimanên dîtir.

2. Pefîbûn û xwerûbûn bi kurdiya zelal û paqij taybetiyeke da zimanê nivîser, nemaze di ristesazîyeke nûjen de, di hin aliyê ziman de ku Rezo mohra xwe dahênerane li ser têkista xwe diyar kiriye, wek nimûne fraza (ji gurd ketin) ya ku di bingeha xwe de piroseya tevnê de bikar tê, lê Rezo gote xiste atmosfêreke ciyawaz de ku ji tevnê hate nav risteyên ziman, wek em bêjin ev riste ji gurd ketiye, yan ev malika helbestê ji gurd ketiye, ango li hev nayê, bi vî awayî gotê giyanekî wêjeyî wergirt. Ev piroseya han ne nivîserekî zîrek be, agah li nihêniyên zimanê Kurdî nebe, nikare di vê piroseyê de serkeve.

3. Riste di qalibê Kurdiya resen de tê, dûr ji forimên

zimanên hevsê wek Erebî yan hinên dîtir. Ev bi xwe piroseyeke pir giring e di avahiya ziman de, û ev bi xwe jî xwênerê kurd ku îro di bin kartêkirina zimanên ne kurdî de perwerde dibe, nemaze li Sûryê ku Kurdî tê de bi awayê fermî nayê xwendin û nivîsîn, çavê xwêner li qalibê kurdiya resen vedikê, dimîne ku ew xwe hîn bike.

4. Ji ber van taybetiyên ku me anîne ziman, Rezo xudan mohereke taybetî ye ku cuda ye ji nivîserên Kurmancînivîs

5. Zengîniya peyvê li nik Rezo derbirîn di têkista wî de xurt dike.

6. Hêz û tuwaneyîya zimanvanî li nik Rezo zimanê têkista wî bi hostayî tete hûnandin wek çawa hevîr di destê nanpêj de bi hesanî pehen dibe, wilo jî peyv li ser zarê zimanvan û di nav teliyên pênuşa wî de werbêj dibe û dikevin rêza hev de.

Rezo ji wan kesên ku ji biçûkaniya xwe ve di warê nivîsîna bi zimanê Kurdî, bi ser ku bi zimanê Erebî jî ta

radeyekê, pêkhatî bû. Rezo xwe di nav baxê zimanê Kurdî de nas dikir û tê de bûbû pale û jîrmend.

V- Rezo û lêkolîna ziman: Uzunname

Rezo lêkolîneke zimanvanî û rexenyî li ser romana "Tu" ya Mihemed Uzun nivîsî, û bi navê Uzunname I, II, III, di govara Dugir de sêxelekî belav kir. Dema xwêner vê lêkolînê dixwêne, du taybetiyên dehênerane, di nerîna min de, li nik Rezo diyar dibin: yek jê di astê zimanvanî de tê, ya dîtir di astê rexna wêjeyî de tê, ku ev herdu rûçik astê dahênana Rezo wek Kurdîzan ji alîkî ve, û wek wêjenas ji alîkî din ve, bilind dike. Ya sêyem jî ev lêkolîn dibe fakterek ku astê lêkolînê di zarê kurmancî de pê bilind bibe, û dibe alîkar ku xwendevan û nivîserên kurd jê fêrî awayên ziman ên rast û durust, ji yên xwehr û çew, bibin. Rezo di vê lêkolîna xweyî zimanî de bi giştî serast çûye, û gelek xal bi şêweyekî zimanvanî dane ber pênuşê ku dabeş kiriye ser sê beşên serekî:

1. Ristesazî û rêziman
2. Idiyim wek beşê frazyolojî û hevoksazî nav lê kiriye
3. Babetên wêje di romana "Tu" de beşê babetên wêjeyî
4. Têrminolojî

Di warê rêziman de, Rezo di awayê karhênana destûrî û ya ne destûrî daye xuyakirin, bo nimûne, tevliheviya cinavên barê rast û yên barê tewandî li nik romanivîs, wilo jî daçek, û nêr û mê. Mebesta Rezo di beşê frazyolojî de "danasîna hevoka rast e di wêje û çanda Kurdî de. Ew hevoka ko dikare kirasekî nû bi ser bejn û bala heyber de, di kultûra Kurdî de, berde. Lê mixabin, ko nivîskarê romana "Tu" ne desthilatê vê piştrastiyê ye".

1. Beşê Frazyolojî

Frazyolojiya idyîm

Wek ez pê agehdar im, ji yekemîn nivîserên ku xwe avêtine nav gêra babetên frazyolojî Meksîmê Xemo tê. Lê min ta niha berhemên wî di vî warî de bi dest nexistiye ku ez raya xwe tê de bidim. Kak Rezo navê Meksîmê Xemo di

nav jêderên lêkolîna xwe de aniye ziman, lê di têkista lêkolînê de nedaye xuyakirin, ka di kîjan goşeyî de nerîna Xemo bikar aniye. Ji bilî vê jî, Rezo di vê lêkolînê de ronî avêtiye ser babeta fraziolojîya Kurdî, wek taybetiyeke zimanî û gelek şaşî di romana M. Uzun de derxistiye û serast kiriye.

Di beşê fraziologî de, nivîskarê romana "Tu", dibêje :

- "Tiriyên tahnebî zû serî dan.... " R.12

Navê "serî" yê tirî, bi Kurdî, weşî (guşî) ye. Û navê dara tirî, mêw e. Dêmek, mêw weşiyên tirî digre. ..û garis, sîr, pîvaz, kelem (lehane) serî didin.

- "ezana xwe dixwendin, .. " R. 39

Melê bang da, azan da, lê Quran xwend.

- ", wekî dara berûyê zirav û dirêj bû. " R. 44

Dara berûyê çiqasî zirav û dirêj be jî, di zarê Kurdî de, ne bûye pîvan ji pesna qamê re. Bejna zirav û dirêj, di Kurdî de, bi dara spîndarê, şitla rîhanê û şiva xêzeranê tê bi navkirin (pesindan).

2. Beşê avakirina hevokan

Nivîskarê hevoka rind jî ew e, yê zanibe hevoka rast û durist ava bike. Hevoka çak, rind, rast û durist jî ew e, ya ko avakirina wê sivik û rewan be, ya ko bi terz û evdazên ziman, rêziman, rêziman û rastnivîsê ve girêdayî be, û wan pêk bîne.

Di rastnivîsa hevoka Ingilîzî ya (kill him, not let him go) de, navê vê bihnokê bûye bihnoka mirinê. Ji ber danîna wê berî " not " fermana mirinê dide, û piştî " not " fermana serfiraziyê dide. Lê, bihnoka M.Uzun, di vê hevokê de, çi rolê dileyize?. Eger nav lê bibin, mirov dikare navê ".

- "Ew ji saet 8-an re 5 bimîne ji derî xuta bû. " R. 148

Avakirina vê hevokê ne durist e. Bi ser vê yekê de jî, avakirina wê ne Kurdî ye. Dem, bi Kurdî forma "kêm" û "û" distîne. Nimûne: saet 8 kêm 5, saet 8 û 5. Wilo, hevoka M. Uzun dibe: "ew saet 8 kêm 5 ji derî xuya". Lê, hevoka navbir (alîkar) "saet 8 kêm 5" bi bihnokan ne hatiye sînor kirin. Û ev tevlihevîkê, bi hevokê re, çêdike. (Raya Rezo rast e – Berzo)

ziman roleke pir giring û hêja, di warê hebûn û parastina gel de, leyistiye û hîna dileyize. Lê, îro roj berdewamiya vê rola objektîv ji rewşenbîrên Kurd tê xwestin. Ji ber êdî ne tenha maye, ko ziman gel biparêze, lê bûye ko gel vêce ziman biparêze.

Lê çawa be, gerek e rewşenbîrê Kurd, berî ko raje pênûsa xwe, karibe bi hişekî kurdî ji xwe re mijûl bibe (û ev problêma nivîskarên me ye), da karibe hevokeke kurdiyî paqij ava bike, û berhemên xwe bi zimanekî sivik û rewan bineqîşîne, mirov bingehên zimanê xwe, bi nezanî, bihêrivîne. Ango, xwe bispêre formên avakirinên biyanî û taybetiyên zimanê xwe dût bavêje.

Ne dût e, ko gelek bi seyr bipirsin: "Ma kî dikare dest bavêje bingehên zimanê xwe, û wan bihêrivîne ?! ". Belê, ev pirseke durust e... ma "kî tiliha xwe dixê çavê xwe !!!". Lê divê em jibîr nekin, ko tiliha me bê hemdê me (ne bi daxwaza me) dikeve çavê me de. Çawa?. Bi asanî... Ji ber me bi zimanê xwe ne xwendiyê, em fêrî avakirinên hevokên biyanî (çi yên serdestên me- di rêya dibistan, radyo, televizyon...û yd. de-, çi

ji yên kultûra cihanî) bûne. Bi kurtî, em bi hişê biyanî diramin, tanî em nema, çî yên me ne, çî ne yên me ne, ji hev derdixin. Wilo, em hin bi hin dûrî taybetiyên xwe (çî civakî bin, çî zimanî bin) dikevin.

Û da ez karibim behweriyên xwe bihtir bidim nasîn, ezê li ser avakirina hevoka kurdî rawestim (ne dûr e ev babet, di pêş de, bibe derîkî lêkolînan) û danûstandinekê, di warê fraziolojiya kurdî de, bi xwêner re vekim. Belê, ez li ser şeweyên sade û hevbend, di hevoka kurdî de, ranawestim. Wilo jî, ez li ser beşên rêzimanî di avakirina hevokan de (hevoka navan ,hevoka hevalkarî, hevoka saloxî, hevoka pirsiyarî, hevoka merbendî, hevoka fermanî... û yd) ranawestim. Lê, ezê li ser taybetiyeke din, di hevoka kurdî de, rawestim-taybetiya fraziolojî di avakirina heyber de.

Zarawayên ziman

Yek ji taybetiyên vê lêkolîne ew e, Rezo girûpek ji zarawayên zimanî wek raveziman (mêtaziman) daye pêş. Ev zarawe di nerîna min de bikêrhatî û şiyaw in, digel ku

lêkolîneke gihastîtir jê re divê da ku em bigihin encamên tekûz. Rezo di danîna **zarawayên** xwe de, pişt bi lêkolîna ziman girê daye, û li ser bingeha şîrovekirina zimanî zarewayên xwe danîne ku ev destûr bi xwe rêgeyeke zanistî werdigire. Rezo weha dibîne ku "di warê ristesazî de du beşên hevoka kurdî hene. Her beşek jî hin girûpên hevokên serbixwe himbêz dike."

1. Hevoka step (qesp):

- a. Hevoka olî.
- b. Hevoka dudil.
- c. Hevoka bêbiheng. e.
- d. Hevoka şîrovekirî.
- f. Hevoka nenas.
- g. Hevoka dengan.
- h. Hevoka dupesin.

2. Hevoka pexox (fiş):

Rengên hevoka step

Gotinên step (qesp) di hevoka step de û di hevoka pexox de.

* * *

Tu çûyî!
Lê ,Tû jibîr nabî heval...!!

Deham Ebdulfettah

*(Bo giyanê wî hevalê sozdar, "
Rezo Osê" ...!)*

(1)

Hîn jî ez bawer nakim ku te koça xwe ya dawî kir ... , te ji nav me barkir û di kûrahiya bêdengiyê de, te riya xwe girt û tu çûyî ...! Gelo rast e tu ji me xeyidî ... û bê xatirxwestin te pişta xwe da me û tu çûyî ... te heval û hogirên xwe di nîvê rê de hiştin û tu çûyî ...? !

(2)

Tucarî ez bawer nakim ku tu ... , tu bi wî dilê xwe yê fireh û hişê xwe yê bîrewer û têgihîştî ... û bi giyanê xwe yê pak û zelal , wekî " Cama Cem" pêşbîn û rastgo..., qet bawer nakim ku, tu soz û peymanên xwe wilo jibîr bikî, dost û hevkarên xwe bi tenê bihêlî...!

Na...! tu ji dilsoziyê dilsoztir î û tu ji mezinahiyê jî mezintir î...!!

(3)

Berî (25) salan cara pêşîn me hev dît , min tu nas kirî . Di wê hevdîtînê de me rewşa wêje û rewşenbîriya Kurdî di ber çavan re derbas kir . Hingê , te nerazîbûna xwe û reşbîniyên xwe diyar kirin û te got : Eger em bixwazin asta wêjeya xwe ya nivîskî bilind bikin, gerek berî ku em binivîsin em zanibin em ê çawa binivîsin. Anku, berî her tiştî gerek em li zimanê xwe vegerin, hinekî li ser rawestin. Ziman tevina hemû berhemên wêjeyî ye. Vêca ku tevina me, bi vê rewşa xwe ya xav û sist ji gurdê ketibe, gelo berkêşanên wê, dê bi çi rewşê bin... ?! Wê hingê min naskir, ku tu hilgirê pirojeyê nîrxdar û hêvîdar î...!

(4)

Me li holên konferans û mihrecanên ziman û rewşenbîriya Kurdî, li Amed û

Duhokê hev dît..! Em bi hev re beşdar bûn... me alîkariya hev kir û me simînar û çalakî bi hev re pêşkêş dikir...!! Di wan rêwîtiyan de nasîna min bi kesatiya te firehtir û kûrtir bû. Min nas kir ku bi qasî tu di simînar û çalakîyên xwe de germ û bejinbilind û zana bûyî, hevqasî jî tu di erk û têkiliyên xwe de nerm û nizim û dilovan bûyî...! Ma ez ê jibîr bikim, ku te di wan hevrêtiyan de, çi ji min re dikir û te çi ne dikir, hevalo...!!

(5)

Dema xwendekariya te li Sovyata berê, gelek xwendekar bi te re hebûn. Hinek ji wan bi xwendina xwe da ketibûn, hinek jî li xortaniya xwe digeriyan û hinekan jî bazirganiya xwe dikir. Lê te...! Te li rex xwendina xwe xulên fêrkirina zimanê Kurdî vedikirin... te hevalên weke " Dr . Bavê Nazê , Dr. Behmen Yûsif, Dr. Heysem Qotreş û hinin dîtir jî " fêrî xwendin û nivîsîna zimanê Kurdî dikirin...! Ma wê çaxê kê bîra giringiya zimanê Kurdî dibir... kê ji bilî te, kê .. ?!

(6)

Hîn tu li Sovyata berê xwendekar bûyî, pirojeya pêngaveke mezintir di serê te de digeriya. Te dixwest ku tu komeleyeke rewşenbîrî digel çend hevalan ava bikî. Erkên vê komelê jî wergerandin û çapkirina berhemên derbarî Kurdan bûn. Di sala (1978)an de te û hevalên xwe " Bavê Nazê, Sadidîn Melle û Mihemed Ebdo Nekarî , " we " Kombenda KAWA " damezirand. Lê – mixabin – piştî demekê ew kombend ji wê rêbaza ku we jê re danîbû hate derxistin.

We jî xwe jê kişand. Ew " Kombenda KAWA" hêj li dar e, weku hêmaya (sembola) wê keda we ya pîroz, weşanên xwe berdewam dike...! Ha ev e tu ...!

Ma yên wekî te , êdî tîn jibîrkin . REZO ...!!

(7)

Yekcar tu li nav û dengê xwe nedigerya .

Hevqas xebata hêja ku te li Sovyata berê dikir, rojekê tenê

jî te amaje pê nekir û te negot min wiha kir û wiha nekir...!

Rojekê min ji te pirsî: Ji bilî wan her (5) çîrokên zarokan, ên gelêrî, ku te û Dr.Necarî we çap kirin, gelek destnivîsên te yên hêja hene, wek (Perwerdekirina Zarokan di Nûbuhara Xanî de, Roman li nik "Mihemed Uzon- "Tu" nimûne, Hevoksaziya Zimanê Kurdî (Sentx), Xwendinek li berhemên Cigerxwîn û hinin dîtir...Hin helbest û gotarên core- cor jî.. !!)

- Pirsî min: Çima tu van destnivîsan çap nakî ??

- Te bi kurtebiriyê seyr got: Pirtûka ku pêjna kedê û bêhna xwêdanê jê neyên ew pirtûkeke bêşûd û temenkurt e!

Lê berî koçkirina te ya dawî, te bi dengê bilind got: (Dem hat, ez ê wan destnivîsan tevan bikim barê mamoste (Fewaz Ebdê), bila wan bide ber tîplêdana kompiyûterê...!! Qey te zanîbû ku (dem hat...) û nema êdî em hev dibînin... ?!

(8)

Heta bi navê xwe yê fermî " Ebdulrezaq " te xwest, tu wî kurtebirr bikî û giyanekî Kurdewarî berde ser, te ew kir "REZO" !

Ez baş lê hay nebûm, min got: " RIZO" ..!!

Te got : Na ... Na , ez ne (birinco) me, ez " REZO " me, ji (Rez û rezvaniyê). Tu têgihiştî?!

(9)

Rastiya herî rast ew e, ku te ji nav me barkir û tu çûyî...! Lê bila giyanê te yê pak li nişîngeha xwe hêmin û aram be, tê di dilên hemû dost û hevalên xwe de... xizim û hogirên xwe de, hemîşe bijî..! Em ê di hemû çalakiyên rewşenbîrî de te di bîra xwe de bînin, hevalo...!!

(10)

..... Rast tu çûyî ...! Lê zû – bizû tu jibîrnabî, heval.. !

* * *

Rezoyê Osê

Wek ku min nas kir

Heyder Omer

Rezoyê Osê yekek ji wan kesên zû ji nav me barkirin bû, ku em hîna jî hewcedarên ked û pênûs û cefayên wan bûn, lê mixabin, wek ku penda kurdî dibêje; gava mirin hat nabejê ev mezin e, an biçûk e, nabêje ev xebatkar, çalak, berhemdar e, an ev tenbel e, belê destên xwe digerîne, û pirêcaran jî kesên kêrhatî, çalak û ji bo gel û welatê xwe sûdar in, bi ber dava wan destan dikevin. Weha jî mirinê vê carê Reoyê Osê ji nav koma çalakvanên me vebjart, û bê dilê me ew ji dest me revand.

Tevî me dizanîbû, ku mirinê ji salekê berê de, li ber deriyê mala wî kon vedabû, derfet dipelandin da derbas hundir bibe, û Rezo jî bi berxwedana bê hempa pê re rû bi rû bûbû, lê nûçeya serkeftina mirinê roja pêncsemê li 4ê avdarê bi min giran bû, wê nûçeyê ez tengijandim, û rondikên min

herikandin. Pê re jî bîriya min vegerande beriya 20 salan.

Min navê Rezoyê Osê bihîstibû, lê min ew ne dîtibû, yekemîn car sala 1990, em pêrgî hev bûn. Hîngê ew ji Cezîrê hatibû, li gel rewşenbîr û nivîsevanên kurd li Helebê, hevdîtin ji bo kovara Stêr pêk dihanîn. Wê hîngê min rastiya tiştên min dibîstin, dît.

Wêneyê wî yê berê, bi bandora bihîstina, di serê min de cih girtibû, ji rastiye dûr nebû; Rezo beriya axiftvan be, guhdarê hêja bû, ku rûmeta kesê hember xwe digirt. Bi hestewerî û rêzdarî guhdarê te bû, gotina te ne dibrî, û gava diaxivî jî, axiftina wî bi pêwr û mêzîn bû, bi dengê nerm û hêdî bû, û ji metelok û pendên kurdî ne vala bû, heya ku cidabûn jî di navbera nerîn û boçûnan de hebûwa, ewî bi berkenî û awayê dostane û hevpişeyî bersiva te dida, û bergeh di nabera xwe û

te de kurt dikir. Ev nirx jî yekemîn nirxên danûstandinên rûmetdar in.

Cara duwemîn jî sala 1993ê me hevdu dît, xemxwariya çand û wêjeya kurdî em kirin hevpişeyên kar û xebata rêdeksiyona kovara (Pirs), û weha heya bihara sala 1999ê em bi hev re man. Xebata bevbeş ya van heft salan kesayetiya Rezoyê Osê li ber çavên min zelaltir kir, ku ew çiqas ji bo çand û wêjeya kurdî fedakar bû.

Cara dawî jî par bû, ku ew ji bo dermankirinê hatibû Elmayayê, lê mixabin ez bi derengî hatim agahkirin ku ew hatiye, gava min telefonî wî kir, ew li ser riya veşerê bû, wê lomê me hevdû nedît, tenê bi qasî nîvkatekê em bi hev re peyvîn. Ewê hevpeyvînê dîsan wêneyê wî yê berê li ba min çespond, û bi ser de jî berxwedana wî ya bê hempa li hember wê nexweşiya giran da xuyakirin.

Rast e, Rezoyê Osê, wek tekmirov, di vê jiyanê de dilopek bû, û di nexşeya êthniya Kurd, û ya cîhanê de, wek ku

Ezîz Nîsîn dibêje, xaleke biçûk bû, lê ewî rola xwe bi diljoji û dilsozi list, û bi cefayên xwe ken û şahî li ser lêvên zarokên kurd weşand, û bû hevalê wî refê, ku hêviya duwaroja wêjeya kurdî geş kir.

Rezoyê Osê çel sal ji jiyana xwe bi ser gelek war û babetan de parve kiribû; ew yek ji endamên nifşê duwemîn bû li jêrxetê, ku sala 1970ê dest bi hînbûn û nivîsîna kurdî kiri bû, û ta roja dawîn bê rawestan dest jê berneda.

Ez naxwazim babetê dirêj, û gotinan dubare bikim, lê dixwazim hema bi kurtahî bînim bîriya guhdaran, ku ew di demezrandin û rêdeksiyonên gelek kovaran de xebitiye, û gelek çîrokên zargotina kurdî ji bo zarokan dane hev û çapkirine, û gelek lêkolînên wêjeyî, hem di kovar û malperan de weşandine, hem jî di komcivîn û vestîvalên wêjeyî de xwendine, bi ser de jî gelek destnivîs bi şûn xwe de hêştine.

Her weha çalakkûna wî di korsên fêrbûna zimanê kurdî de, di damezrandin û endametiya

gelek sazî û komelên rewşenbîrî
û wêjeyî yên kurdî de, di
beşdariya gelek vestîval û
kongirên wêjeyî de jî ji bîra
nabe.

Ez naxwazim bibêjim, ku
koçbûna Rezoyê Osê valahî di
meydana tevgera wêjeyî û
rewşenbîrî ya kurdî de peyda

* * *

Ji bo Mamoste Rezo Osê

Di 4ê Avdarê de, te koç kir.
Tu dibêjî qey koçkirina te di wê
mehê de, xwesteka te bû! Ev
meha girêdayî bi hişê gelê kurd
re, bi bîranînên wî re, û
dilşewatên wî re, ev meha ku
yek roj tenê, em xwe tînin bîra
gelê cîhanê, em li ber xwe didin
û dijîn.

Mamoste Rezo: Tu pir hêja
bû, erê laşê te ji nav me barkir,
lê canê te heta hetayî wê amade
be, musîka dengê te bi ferehiya
hişê me re dimîne, çawa li ser te
bigrîn? Û lehengî ji min re divê,
tenê ku li pêşberî navê te
rawestim. Silav û rêz bo canê te
yê pak, silav û rêz ji bo yê ji
min re mam û kurmam û bira, û

kir, ji ber ku rêhevalên wî hîn li
rê ne, û wê li rê bimînin, û zikê
jina kurd jî ne zuwa ye. Lê tenê
dixwazim bêjim, stêrkeke geş ji
ezmanê wêjeya me ket, divê em
her hewl bidin, da ronahiya wê
ji bîra nekin.

Elmanya, 10. 04. 2010

Zehriya Osê

heval bû. Silav û rêz bo yê
dilsojiya cîhanê tevî, di
kesayetiya xwe de civandiye,
silav bo pêûsa pir bi huner,
pêûsa ku dilrehetî ji min dizî.

Dibêjin: Helbestvan, namirin,
bes wilo xwe didin xuya kirin û
diyar kirin, emê çawa çîroka
koçkirina te bawer bikin? Tu
helbestvanî, torevanî,
rexnevanî, rewşenbîrî,
mamosteyî û evîndarê zimanekî
yî, te berdewamî jê re dixwest,
û şûna tiliyên te li ser mane.

Silav li gorna te, mala te ya
dawî, li xaka pak û paqijbûye,
pîrozbûye bi hembêzkirina laşê
te. Te ew xak kire dîrokê, lê ne

tenê nav ji kesê hêja dimîne,
belê dîrok lûs, rêyên çûn û
hatina wan jî diparêze, di nav
rûpelên xwe de.

Silav ji bo şîna di çavên
herdû kurên te li biyanîyê. Silav
ji bo şîna jina te ku xweşî û
nexweşî bi te re hevpar kiribû.

Bere laşê te bi xweşî raze û
buhuştî bimîne, tu bi canê xwe
di nav me de amadeyî, her weha
û her gav, her car canê te wê bi

* * *

me re bijî, bi hêvî û
xwenerojkên xwe di wijdanê
şiyar de. Bere dîrok raweste û
dergehê mezin veke ji navê te
re, dergehekî fereh weke dilê te,
dergehekî rind û zirav weke
bejna te, dergehekî bedew weke
keda te. Tu tim ji me re mûm,
fînd, hîv û tavî. Em li ser şopa
te her dem dimînin. Ez bi hêvî
me ev silav bighîje canê te yî
pak.

Peyv di çavên min de man

T. Marîî

**Bo mamosteyê min Rezo
Keservedana kîjan sinorî ye, li
nav xunava hizra te bû bayekî
sor?**

**Kîjan xem di çavên şevê de,
aleya şikestinê daneçikand?!**

**Kîjan xewn li ser derfeşa
peyvê bêhiş ket?**

Şev dubare dibin
Ez ji çavên Salar û Rewend
xerîbiya xwe serhev dikim
Adar ji tiliyên te peyvên xwe
rêsan
Bajar diloyeke gerok e, li
hindava dukela dilê min
Dilê me jî sînemaya şînê ye
Te hêviyên xwe, li ber êşeke
bêdeng xelmaş kirin
Li bîra min têt, dem û
dîmenên hizûra te
De bila stukura vê mirinê
bişike
De bila perdeyeye reş li
sînore xezebê bête alandin
De bila ..

**"kevoka min ji ref ma ye
nema tê lîs û hêlînê"**

Ji kîjan şevê?

Ji kîjan êşê?

Ji kîjan şikestinê dest bi
sirûda çûna te bikim?

xewna min bayê serê xwe
nuxumand

Şemendefereke ji ewrên
payîzan

Perava zaroktiyê di quntara
şanoyeke

bidawînehatî de, xewna min
û te

Tabloya êvarî, ji toza li ser
giyanê tilûran rabûyî.

**"Kevoka min ji ref ma ye
... nema tê lîs û hêlînê"**

Awirên te evîneke bayî ne, li
ber dergehê deryayê

hevokên hingavtî ji hezkirina
tîpên te,

ez dûr û bêpişt mam, Zagros
çelmişî

Tu stêrek rijiyayî li ber hilma
peyvê

Bask û hevokeke nefiriyayî
di nav êşê de
Çend rûpel in ji viyanê..?
Tu mayî pirtûkek nexwendî
Li nav rûpelên pêkola
qedexe.

Sirûdeke lişûnxwehiştî di
eniya me de
Tu ber bi lotkayê ve û ..
*"Ez û kevoka min ji ref
mane nema tèn lîs û
hêlînê".*

* * *

YADÎGARA ÇILÎNIYA MIHRE REZOYÊ OSÊ

Arşek Baravî

Mirina tal jiyana şêrîn ji temenê
bêgunehan didize, serî li
xwezaya xuristê digêrîne,
gumanên arîşenan dihingêve û
mîna sirûşeke asîmanî
dibuhûre.., lê ebroya pingavên
nejbîriyê zik-êşe: aferîn ji
şahnazên şareza re û mixabîna
temenê talanbûyî .
Bîranînên mihreyên zana ..
givişkên petrîşokêne û pariyên
zilendarêne, bi hêsirên
daweravtî re .. danaqurtin...
Bindestî, bi ser bextireşîya xwe
de, reşmizgîniyan werdigire,
stêra mihre REZO ji asîman
hilat, lê bîranîna xebat û
tekoşîna wî ji dilê gelê wî

hilnehat, ê çû ji kîsî xwe çû , lê
REZO ji kîsî wêjeya me çû...
Li nav me ne û ji me ne, mîna
dara jiyane bêyî avdan in, bi
koçkirina wanî dawî re .. em
pelemarên şanazî û
mizyariyane...!!!

Nuhurandin:

Temenekî navdar
ji dara me hilweşîya...
Ronahiyeke bêpar.. û hejar
bi kovanî... ji me vekîşîya...
Givaleke reştal ,
tava teyroka xeman,
bi tevzînokên terezê
û taya derdên dîl re ..
dibariya...
Bazê perbelek.....

bi dilekî kul .. ji nav me bar
kir
û firîya...
Fermiska Binefşa narîn
bi rewaya jîyanê re giriya..
û kenîya..
Zuha ne bû..
bi hêmenî, bêyî derbirîn..
dikir feryad .. û
diqîriya..
Li ser dêmên gulê,
minyamîna .. xwe vedizî
Sersaxî û xweşnoşî ji
malbata mihre REZOyê OSÊ
re bi taybetî... û ji gelê wî re
bi giştî.

û revîya...
Ne çiya .. liviya,
ne jî êşa jana giyanê bi rûmet
westiya...
Buhîşt xwe kedî bike..
ey mihre..
da tu ji gulîstanên kurdî,
mizgîniyên şêrîn wergire ,
Li gel bihna Nefel , Endeko ..
û Beybûn..
û pelên giya.

Spasî ji endamên kovara
PIRS re, ên ku ev bîranîn bi
rêk û pêk kirine.

Amûdê 12/4/2010

* * *

Hestê min

Fîxan Osê (Reşê)

Kulîlkek ji ber te dinalî
Û kevokan barkir ji ser darê
Jiyan ji bo we te axîn e û
Çav li ser tije xwîn e
Bê te buhar tim xemgîn e
Bê te helêbest sêwîne
Ji ber te dikin girî çavên
Dayik û bavan
Ezê navê te hildim li ser
Mijgulên çavan
Me teva serê xwe ji ber

Te Hilda bilbilê kurda
Dil şahiya kurda
Ji Qamîşlo heya hemedanê
Li ser te dinalî
Rû reşa cavê avdarê
Buhar li me kir şevêk tarî
Lê yê wek te mam Rezo
Roj bi roj di dilda şîn dibin
Em sozekê li ber te dikin
Bê te nabe vîn û jiyan

Bê te nine helbest û Bê te buhar nabe çeleng
hozanvan Li ser çiya herdem bi deng î
Tu hozan î bi nav û deng î Tu hêviya gelê kurda bû

* * *

Rêheval Rezo

M.E.Heso

Xama te ya pir biker xweşxwan nivîsin bi zêr
Zaravê dê geş dikir wêje bi me xweş dikir
Ristên li ser evînê strabûn ew bi xwînê
Bi wê şewazê şerîn derman dibûn sed birîn
Ronî dibûn pir mijar pê geş dibûn nûbihar
Rûpel bi zêr nivîsî bernedin vî werîsî
Fermanek hat dest bi dest vê re ew xame şikest
Mina bista agire kes neşê wê ragire
Koç te xiste dorê berê wê daye gorê
Peyamê xweş dixwînim lewra te bîr ve tînim
Ev keleşpor zengîn e dem diçin ew dimîne
Pêta kop û zinara winda dibe ti cara
Ji bona doza rewa ked naçe bedîhewa
Da zû bimre çavnebar hevdû bigrin hey hewar
Serkeftin nêze dayê bê wê xewa me nayê

Qamişlo 28.03.2010

* * *

Keskesorek ji deqşûrî

Abdisemed Mehmûd

Êvar e ji deqşûrî
Xuleke bê dengî
Xwe li kenarê
Gulîzeran pêça
Sîtavên avdarê
Li bejna çîçekan digerin
Hermela çilwêrin
Di berqefa şanîdarê de
Rewake daxistin
Waxxxxxxx ev çi şap bû ?
Xwen li ber xwe wêran kirin
şevkê zingilekî çav bêçar
kirin
Dema heyvê valahiyek pêça
Stêrek qamişlokî
Di jiyana duyem de xwe
avakir
Belê sozek neda

Işev civat e?
Adar e
Rojnemevanî ye
Waxxxxxxx ev çi şap bû?
Xwe li bejna me girêda
Li deqşûrî hilatî
Keskesorek
Ji min va xwiya ye
Mezkekin
Li ser tîpa kurdî
Bazbelek e
Dîrokê vekin
Jiyan ne bi roj
Yan bi sala ye
Jîndarê pirsî kurdî
Hembêz di çavên xwe kin
Waxxxxxxx ev çi şap bû
Civatên me seqet kirin

14-4-2010 z

* * *

Çavê min dawerivîn

Melevan Resûl

Rûgeş û şa me
Bi lêvên girmijî çavan vedikim
Geh ji şerma û geh ji xeman
Rondikên germok
Ji eniya min ber bi singa dûkelêz girtî ve diherikin
Ooooooooooox çiqas germ e ev sing
Ji qehra sala ye
Ji kîna xedar dixulxul e

Ma ev sîng wê bi têra çi bike û çi neke ?
Ne giriyê li ser bav û dê ye
Û ne jî şîna Rezo yê Osê ye
Karwanek qijilî li ber tava havînê
Yaka yeko têne hingavtin û li binê dareka kawî bingor dibin
Her dem di şîn û behiyê de me
Hêstir û giriyê xwe dadiqurtînim
Ji nava şîn û behiyê dikenim , di girîm
Bi hêvî me , bi omîd im
Sertîp ji rewanê min diherikin
Navê xwe li minalekî nûzayî dike
Li ferhenga afrênerekî dike
Li qelemkêşekî resen dike
Hev cotin xwedêdan û behî
Cêwî ne nav û nîşan
Giriyê sêwî û çepelan dirêj e
Ez ne sêwî me
Li Dindila xwe siwar im
Di qoşm û cirîda vejînê de me
Meydana min qada heskirinê ye
Bûka min jî tûrînek xwemal e

Ha hiiioooooo , ha hilo
De bila selefê siwaran bi lîlînê narînan re

Helbestan li hev bar kin
Û darbestek ji tîpên pijayî
Li ber gora her wêjehezekî , destegulek bineqîşîn
Bila giriyê zirbehrê ziman
Ji gulvedana zeviya qeşeng birije
Ezê bi têra xwe bikenim
Û bi têra xwe giriyê şînê bi zimanê xwe bikim
Em bi şînê ne bawer in û bi şahînetê ne kedî ne
Ji lew hêstir ji çavê min dawerivî ne
Bila zimanê kurdî û serê milletê kurd sax be

/ 15/4/2010

* * *

(vê pexşanê diyarî giyanê nemir Rezoyê Osê dikim)

Arjen Arî/ Amed

**Bo Rezoyê Osê
Bi tena serê xwe**

her ku bi jor de bilind bibî, yên li jêr biçûk dibin.
biçûktî: mezinahiya sibe...
çivîk jî biçûk e.
ji hemû biçûkan ez ji nefsbîçûkan hez dikim
û ji hemû teyran ji bazê çiyê!

kelereşk* li çolan dijî
xilt di binê axê de -ku axê bi serê xwe de didêre -
li tevî ya qumriyê meke kûkûkûya bûmê:
yek deştî, yek berîvanî; çiyayî me ez.
'Xom...Ew wextey ballindem'
navê dîwaneke Şerko: Ew wextê teyr im ez!

'her teyr bi refê xwe re difire':
refê qulingan, yê çivîkan, yê reşêleyan...
gur dixwe dibêjin, miya ji kerî weqatayî
gotineke din bi guh ve wek guhar mayî:

‘kew...dijminê serê xwe’!

ez bi serê xwe, roj bi serê xwe
diçim, min rahiştiye serê xwe
li cihekî şev konê xwe vedigire
roj diçe ava bi tena serê xwe

* qijk,qirak,qijak

* * *

Nivîsarê Dêrîn

Mehfûzê Mele Silêman

Bi xwedayê min û te
Ku her ev bû **sûnda** te
Zû bû çaxê çûna te
Dil bi kul bû ji bo te
* *

Çi bilind bû bejna te
Çak û xurt bû xama te
Tezûdar bû pirsra te
Pak û rind bû rêza te
* *

Hêlîna me xirabû
Ya dost û hogira bû
Serî li me gera bû
Dema janê dest da te
* *

Tu xemxwar û dilxwaz bû
Bi teraz û endaz bû
Rawêjkar û bi raz bû
Nerm û xweş bû cira te
* *

Ji bîrnabin karê te
Helwest û gotarê te
Wê tim şîn bin **çarê** te
Li hemî avdarê te

* *
Çi pak bûn paşilê te
Bedew bûn tim cilê te
Çi paqij bû dilê te
Piran digirt mile te
* *

Civat bi te xweş dibûn
Aheng bi te geş dibûn
Lê gava dubeş dibûn
Ne diketin serê te
* *

Penceşêr xwe hardike
Mala xwe xira dike
Te bê hêz û tihn dike
Bêbextî kir, hate te
* *

Tu ji destan revandî
Li welatan gerandî
Bal bihuştê tu şandî
Nemirî.. kir para te
* *

Ey nivîsarê dêrîn
Ramanyarê dûr nêrîn
Ronakbîrê tac zêrîn

Kurdperwerî şana te

* *

Kawa û kom mihder in

Sîtêr û **pîrs** bînerin

Berhem bi xwe rêberin

Dilsozî simbola te

* *

Çav tim bi te bel dibûn

Nav jî bi te bel dibûn

Çewt û qelp mexel dibûn

Bi bîn û hebûna te

* *

Hezar heyf û mixabin

Ku wek **rezo** bêcan bin

Xwedî û dost ber sax bin

Yê mayî her welate

Qamişlo 14/4/ 2010

* * *

EM

(Diyarî giyanê Rezo yê Osê)

Mehmûd Badilî

ji her tiştî re
em pencere û derîyên vekirîne

ji civîkan re

ji pisîkan re

ji koçikan re

ji dûpişk û maran re

lê di ruwê hevdû de

em derîyên girtîne

dilên me

her tiştî

di gêdûkên xwe de dicivîne

êş û şahîyê

girî û gerinijandinê

dixsî û hezkirinê

em êş û girî û dixsîyê

di zikê hev de diçînin

şahî û gernijandin û hezkirinê

weku gulên

bi ser ruwê xelkên biyan de
diweşînin.

ji biyanîyan re

em pencereyan

di diwarên tarîyê de vedikin

li dûrahîyê

em kezîyên rokê dihûnin

di ber çavên me re

hemî tişt derbas dibin

em jî di ber hev re

em roka xwe didin destê

xirecirê

û bi çavên şaş

silavan li hev dikin

çavên me şaşin

em her tiştî dibînin

lê herdem xwe ji roka xwe

wenda dikin.

Rêwresmên çelrojiyê li derveyê welêt

Rewşenbîrên Kurd li derveyê welêt jî end çalakî li boneya çelrojka ciwanemerg Rezoyê Osê li dar xistin.

❖ Li bajarê **Hannovera Almanya**:

Li roja 11.4.2010an çilrojya goçkirina **Rezoyê Osê**, ji hêla hevkarên wî, endamên kovara **PIRSê** yên berê hat lidarxistin. Di daxuyaniya wan de wiha hati bû:

Hevalên Rezo yên ku bi hev re di kovara **PIRSê** de kar dikirin, wek erk li ser xwe bîranîn li dar xistin. Endamê kovarê yê berê nivîskar Merwan Osman, çend malik ji helbesteke xwe xwend.

Lêkolîvan Heyder Omer, ku bi salan, di gel Rezo, di redakisiyona Pirsê de kar kiriye, wî jî gotara xwe ya mişt keser û kovanDi navberê de, peyva malbata Rezo û malbata xezûranên wî mamoste Samî yê Ehmedê Namî hate xwendin û nivîseka mamosteya dilşewat û

dilkovan di derheqê zavayê wî de Rezo hate xwendin.

Name, birûsk û telefûnê jî ji sazî û nivîskaran gihane koma



Ji beşdarên ahengê

lidarxistina bîranînê û hatin xwendin. Wek: Konê Reş, Evdile Koçer, Edîb Çalkî, Nûnerê Partiya PYD, Dr.Zerdeşt Haco serokê **PENa** kurd, **Yekîtiya Nivîserên kurd-tayê Duhokê** wan goti bû ku ew jî dê roja 12.04.2010 bi vê boneyê, 40 rojiya wî di gel herdû mamosteyên nemir **Hafiz Qazî û E.Hekîm Segvan** li Duhokê dar bixin.

Nivîskarê kurd Newaf Mîro, ji bakurê Kurdistanê, axaftinek kir û helbestek xwend.

Dr. Kamîran bi navê malbatê gotinek got. Biraziyê wî Azad jî axaftinek kir û spasiya hemî beşdaran kir.

Di dawiyê de, T.Marîni Endamê berê yê kovara PIRSê, helbestek bo wexerkirina mamosteyê xwe Rezo Osê

nivîsbû û diyarî giyanê wî pak kir.

Di dawî de, komîta amadekar ku ji Heyder Omer, Merwan Osman û Tengezarê Marîni pêk dihat, spasiyên xwe bo hatina hemî beşdaran pêşkêş kirin û sersaxî ji hemî nivîskar û rewşenbîrên kurd re xwestin, û bo malabta wî sersaxî û dana sebr û aramê xwestin.

* * *

❖ **Li Berlînê:**

Komela Kurdên Sûrî li roja 18.04.2010 çelrojiya Rezoyê Osê pêkanî. Endamê Komîtê Baha Mihamed helbesteke xwe ji xwend, û bi firehî axaftinek li ser Qonaxên jiyana delal Rezo pêşkêş kir. Gotina hemî beşdaran li ser hêja Rezo wabû:

Rehmetî Rezo karîbû mîrasa miletê kurd di warê Zimanzanyarî, Nivîsandin û Helbest û Hûnar de zengîntir bike. Û gotin bila serê miletê Kurd sax be û Kurdistan azad û ava be.

* * *

❖ Li Stockholma Siwêdê:

Li gor biryara Federasyona Komelên Kurdistanê, di 18.4.2010 de li baregeha Federasyonê li bajarê Stokholmê ahengeke gotaran ji bo çilrojîya koça ronakbîrê mezin Rezoyê Osê hate lidarxistin.

Rêwresman ji aliyê seroka Federasyonê xanim Şermîn Bozarselan, dest pê kir.

Pêşî nameya malbata Osê û malbata Namî bi hev re hate xwendin. Pişt re çend rêz li kurtejiyan û berhemên wêjeyî Rezoyê Osê hatin xwendin. Pişt re nameya mamoste Samiyê Ehmedê Namî hat xwend.

Piştî wê hin hevlên Rezo yên kevin ku li ahengê başdar bûn, li gor tecrûbeya xwe bi mamoste Rezo re, jîyna wî ji rewîştên wî yên bilind hewaldan wek:

Welatperwerî, zimanê resen, dilsoziya bi dostan re, zarê şêrîn, civatxweş, wêjevanê berhem bi nirx, rexnevanîya

babetane, rastgoyî û mêranî, ronî kir.

Wan bang kir û got ko pêwîst



Ji beşdarên ahengê

e berhemên Rezo, yên wî nîkarîbû derîne, bêne çapbikirin û bi hêvî ne ko dê sibe dara Rezo ber bide û dê navê Rezo li dibistan û dezgehên kurdî niştîmanî bête kirin.

Pişt re, nameyên dost û hevalê wî jî hatin xwendin. Tê de kar, sincî, wêrekî û şarezahiya wî ya di warê zimanê Kurdî de bilind hat nirxandin, û gotin:

Hezar silav li giyanê pak yê Rezoyê Osê, ew dê ta nemayê bête bibîranîn.

* * * * *

**Name û Gotin
ji Malperên Êntêrnêt û Lênûsa
Serxwaşkirinê**

❖ **Nivîsarên ji Êntêrnêtê.**

Bi dehan name, birûsk, gotin û nivîsarên kes û saziyan li ser goçkirina Rezoyê Osê di malperên Êntêrnêtê de hatin weşandin, lê ji ber hejmara wan a mezin, emê tenê hinên vebjarte, nemaze yên sazî û weşanan, li jêr dînin:

▪ **Prof. Dr. Celîlê Celîl**

Kovanî û sed kovanî bona wefata rewshebîrê kurdî welatparêz Rezoyê Osê. Hevnasîna me ji Moskvayê hebû. Jîyannîgarya wî xweşmêrî ku Konê Reş bi besa nebxêryê gîhande min, dilê min vê berbanga zû hingaft û ez xemgîn kirim. Rizo yek ji wan xizmetkarê ronekbîrya gelê xwe bû, ku xizmeta xwe bê deng û gazî herroj, herdem dîkir. Ew yek ji wan welatpar û kedkerên

gelê kurdê Sûryayê bû ku sînor nava parchayên Kurdistanê nas nedikir, xizmeta wî li hemû aliyan li hemû çalakiyan da hebû. Heyf û sed kovanî bona wefata wî ya bê wext. Gelî kurdên dilsoz ên Sûryayê, Rezo çû, bû cî buhuştî, lê ked û bîrawerya wî wek nimûna finda bi ronak li nav gel da me. Bila serê malbata wî, bira, pismama, heval û hevkar sax be.

Nemsa, 06.03.2010

▪ Weşana NEWROZ

Malbata nivîskar û
rewşenbîrê Kurd ê dilsoz
REZO! Nivîskarên bi zimanê
Kurdî!

Piştî kêferat û
berxwedaneke derdora salekê bi
nexweşiya penceşêrê re,
rewşenbîr û nivîskarê zimanê
Kurdî, kesayetiya dengewar û
dilsoz, mirovhez û zîrek, birêz
Rezoyê Osê ji nav me bar kir.

Bêgomane her kesê ku bi
çand û rewşenbîriya Kurdî re

têkildar û mijûl e, nav û dengê
mamoste di gastîna rewşenbîriya
Kurdî û rola wî ya erênî di
civakê de bihîstiyê. Dilê me
hemiyar bi koçkirina birêz
Rezo êşiya.

Hêvî û omîda me ew e, ku
cihê wî buhuşt be, serê malbat,
mirov û xwediyên wî,
rewşenbîrên Kurd hemiyar
xweş be.!

05.03.2010Z ,2620K

▪ Behîname

Dost û birayên hêja
Malabata mamosta Rezoyê
Osê...

Em bi agahdariya koçbûna
mamosta Rezo pir êşiyar, belê
êş û xemgîniyeke pir giran di
dilê me de cih girt, mamosta
Rezo di nav xelk û miletê xwe
de xwedî navekî pir bi nirx û
rûmet bû, di biwara ziman û
wêjeya kurdî de bejneke bilind
bû.

Bi rastî, koçbûna wî ku hîna
di çax û benga xwe de bû,
ziyaneke pir mezinbû ji hemî

miletê kurd û ji xelk û dost û
malbata wî bi tevayî re.

Her em sersaxiyê ji miletê
kurd û malabta wî re dixwazin.
Dilovanî û bihuştê jî ji
mamosata Rizo re.

Helbestvan û nivîskarên
bajarê Heseke:

Rêwî (Mihemed Xelef) /

nivîskar

Mehmûd Badilî / helbestvan

Ibrahîm Ebdî / helbestvan

Mehmûd Seberî / helbestvan

Mi'sel Osman / helbestvan

Wecîha Ebdirehman / çîrokvan

Sêfedîn Qadirî / helbestvan
Ibrahîm Xelîl / nivîskar
Xalid Omer / helbestvan
Hisîn Ma'mê / helbestvan

Axîn Mîrxan / helbestvan

7/3/2010

▪ Komeleya Nivîskarên Kurd/Amed

Di wextekêku me biryar dabû, bi navê Komeleya Nivîskarên Kurd emê bên serdana qelemdarê wêrek û zîrek, xoşewîst Rezo Osê ; ji nameya rêzdar Konê Reş û telefona birêz Siyamend Biraheîm em pê hesiyar ku çûye ser dilavaniya xwe.

Bi qasî ferdekî malbata wî, em xemgîn in.

Ew bira-nivîskarekî nefsbîçûk, mirovekî xweşbîn, hevalekî zarxweş û sohbetxweş bû.

Ew li ser riya bêdawî ya ziman û çand û toreye kurdî

neferêkî bêwestan, xîretkêş û hizirgewre bû.

Em dibêjin, her mirin hebekî zû ye.

Em dibêjin, her mirin bêşerm û bêrû ye.

Em sersaxiyê didin malbat û heval û hogirên wî.

.....

Li roja 30/04/2010an jî, Helbestvan û nivîskar, **Arjen Arî**, ji ber Komeleya Nivîskarên Amedê de bi hatineke taybet ji Diyarbekirê hat Qamişlo û serdana gora Rezoyê Osê kir.

▪ Hesên Silevanî:

Serokê Yekitiya Nivîskaran Kurd li Duhok

Nivîskarên rojava yê hêja
Binemal û kes û karên nivîskarê
hêja Rezoyê Osê:

Bi kul û kovan nûçeya
wexerkirina nivîskarê kurdê
hêja - Rezoyê Osê gehiştê me,
ez bi navê xwe û navê hemû
endamên yekitiya nivîskarên
kurd li Duhok, serxweşiyê li
binemala xudê jê razî û dost û
heval û nivîskarên kurd û li xwe
dikim.

Rizoyê Osê navekî diyar bû di
qada rewşenbiriya kurd de, bi
qelem û berhemên xwe,
berevanî ji peyv û edeba kurdî
kiriye, çjhê serfirazî û şanaziya
me ye li bakûrê kurdistanê.

▪ Birûsknameya Sersaxiyê

Em wek endamên ”komîta
Mehrecana Helbesta kurdî 2009
li derve” koçkirina nivîskar û
evîndarê zimanê kurdî Rezoyê
Osê ziyaneke mezin ji bo xwe û
gelê kurd dibînin. Gorbihuşt
Rezo hîna dikarîbû gelek ked û
berhem bidana pirtûkxana
kurdî, lê mixabin zû ji nav me
koç kir. Kesên wek Rezo ne
tenê ji kîs malbata xwe diçin, lê
belê em tev de bi valahiyeke
mezin hestiyar kirin û êşandin.

Bişkdariya wî di festevala
Duhok ya rewşenbîrî ya duyem
li bîra meye, û xemxoriya wî li
ser zimanê kurdî, cihê
rêzgirtinêye.

careka dî serxweşiyê li we
berêzan dikim, û hividar in ji
xudayê mezin cihê wî buhiştta
berîn bit.

Spasiya Mamostayê xwe ye
berêz Deham Ebdulfetah dikim
, ji bo xwendina biroska
serxweşiyê ji ber me ve, bi vê
helkeftina diltezin.

Serê milletê kurd sax be.

Wisa xuya dike ku dîsa Adarê
birînek din di dilê me de vekir.
Emê tu carî te jibîr nekin û
nameya te li erdê nahêlin. Serê
malbatê, nivîskar û gelê kurd
sax be.

Endamên Komîta Mehrecana
Helbesta Kurdî 2009 – li
derve:

Keça Kurd
Elî Cefer

▪ Rêberê Silvî:

Xwediyê hestên nazik û dilê mezin, Mamosta REZOYÊ OSÊ!

Îro, em gelek dost, heval û hogirên te, li ser benderên gundê Degşûriyê li dora te civiyane, destên me li ser hev in, hişmetkar û stuxwar xatirê dawîn ji te dixwazin. Min, hilwest, gotin, cefa û xebatên te di bîra xwe de tanîn, di nava bîranên xwe de noq bûbûm, ji cih û demê bi dûr ketibûm dema dengê xwişka te ya ku bi şewat digirî, ez hişyar kirim û veğerandime ser rastiya dem û cihê ez lê, wê digot û dibiland:

"Hêjawa birawo, bi qurban im birawo,

Ez heyrana te û hevalên te me birawo.

De ka serê xwe rake, li dora xwe binêre birawo, rabe mêvanên xwe bibîne heyrano.."

Bê vîna xwe, di hundurê xwe de ez keliyam, agirê dojhê

kete dilê min û çavên min teji rondik bûn!!...

Ma hemberî vê fermana Xwedayê gewre, ji rijandina van herdu rondikên germ pê ve çi ji destê min derdikeve kekê min?!...

Belê, hêjawa, di vê gorê de serî deyne, çavan bigre û bila dilê te bê kul û xem bimîne, ew tovê ku te û hevalên xwe bi dehê salan çandibû vaye kat daye, şîn bûye, kulîlk girtiye, îro bi hezaran, bi sedê hizaran keç û lawên gelê te li zimanê xwe xwedî derdikevin, bi serfirazî ew pê dixwînin û dinvîsin û ala zimên bilind hildane jor...

Bila dilê te yê mezin bê derd û kul raze ey heval, westan û cefa te ya ji bo ziman û wêjeya Kurdî badilhewa ne çûye, xebata te ya di STÊR û paşê 17 salan di PIRSê de li nik gelê te cihê rûmeteke mezin û

giran e, nivîs û berhemên te jê re sermîyanekî buha ye.

Belê mamoste, ez nizanim derheqa koçkirina te çi bêjim û çi ne bêjim, lê ezê jî weke xwişka me gotiye bêjim:

"Hêjawo hevalo, xwezî hêj tu bimayî, da ku te berhemên keda xwe dîtiba. Hêjawo hevalo, xwezî hêj tu bimayî, da ku şagirtên te ji giranî, hişmendî û dûrbîniya te bêtir sûde bigirtana!!..."

Erê keko, em tev tovê mirinê ne, tu kes ta ebed sax namîne, lê tiştê dil û hêviyên mirov xweş dîke wefadariya gel e, ewê ku mirovên mîna we her û her di hişê wî de zindî dimînin.

Çavan bigre, bila dilê te yê mezin ê westiyayî di xaka bav û bapîran de palde, di hêlana hevrêşimî ya ji helbestên Cezerî û Xanî hûnayî de têkeve xewa giran!.

05.03.2010Z

* * *

❖ **Nivîsarên ji lînûsa serxweşkirina
Rezoyê Osê de**

Di lînûsa(deftera) bin konê şîniyê de, gelek rewşenbîr û torevanan, çi bi zimanê Erebî, çi jî bi zimanê Kurdî hestên xwe yên xemgînî û dilzariyê anîne zimên. Li jêr, emê çend hastên bijarte yên bi zimanê Kurdî ku di lînûsê de hati bûn tomarkirin ji xwendevnên PIRSê re biweşînin:

▪

Ji hêja, rehmetî "Rezo Osê" re..

Bi dilekî xemgîn, bi kuleke mezin û bi derdekî giran ez bejna xwe li ber koçkirina te ditewînim. Tu çûyî ber dilovaniya Xwedayê mihriban, lê te dinyak kul û keder li pey xwe hiştin. Bi hêvî me

Xwedayê dilovan te rehmet bike û te bi dilovaniya xwe şa bike, cihê te buhuştê rengîn be. Hezar rehme li te, serê mirov, kesên te û heval û hogirên te sax be!

Hevalê te
Hunermend **Seîd Yûsif**
Qamişlo 07-03-2010

▪

Rezo...hêjayo
Gotin tenê, hindik in!
Ne têra te dîkin...
Ne ya min!!
Heyfa te..!
Dîsa heyfa te..!!

...Taha Xelîl

▪

Kurdistanê aşîqekî xwe winda kir!

Ez li **Birca belek** bûm, yekemîn car e di jiyana min de ez di dîtineke gelek pîroz de bûm, min li wir mirina kekê Rezoyê Osê bihîst, hinga pê hisiyam ku Kurdistanê aşîqekî xwe winda kir...

Erê, dîtina Birca belek ku piştî 163 salan artîşa Tirkan jê derket, û bihîstina mirina mamoste Rezoyê Osê... Hem kêf û hem şîn bû!! Kêfa vegera Birca belek û şîna oxirkirina Rezo...

Rehma Xwedê lê be, serê Kurd sax be.
malbata wî sax be, serê gelê

Mustefa Reşît Omerî/Nisêbîn

■

Li bajarê evînê,
Li gundê Dekşûrî,
Tev bû hawar û girî.
Ey Avdarê, ey adarê,
Li te bê olê li te xedarê,
Te siwarekî pêlewan, ji hespê anî wxarê.
Te jimara çara ji adarê li me ,
Kire weke zihakaî mara wey xedarê.
Te ji nav me bir mamostayê meyî hêja.
Rezo, bavê Salar, ez ji te re dibêjim:
Kovar û pirtûk rondik gelek rijandin,
Çav ziwa bûn û pêre çapxana şîn kişandin.
Tu dilê milletê xwe bû yî û tu di dilê gelê xwe de mayî!
Ma te nikaîbû çend salekî din berxwedanê bikî li dijî êşa xwe ya giran ey Bavê Salar?!!
Lê felek bê bext e, zora te bir ey birayê hêja û delal..!!
Sed silav ji bo canê te ey hevalê şêrîn û dilovan.
Tu bûyî nemirê welatê xwe!!

...Azîz Hacî

■

Bi dilekî kul, bi çavekî ji tendurustiya toreya wî tê, lewra
hêsrana şil, me koçkirina koçkirina mamoste, zirareke
mamoste Rezo bihîst. Bi rastî, mezin bû ji pêşxistina zimanê
heger millet laş be, nivîskar û Kurdî re. Lê ya ku dilê me xweş
hunermendên wî rewan in. Ji dike ew sîsikên ku amoste
ber vê ye ku xurtbûna millet ji çandine, wê şîn bîn!!..

Ibrahîm Ebdî-Mişel Osman

* * * * *

Beş –IV-

((Deqeke vabjartî ji nivîsarên Rezoyê Osê, bi navnîşana "Palo rabe", di hejmara kovara Pirsê ya 35an de hati bû belavkirin. Ew bi zimanek pîr pak û sade hatiye nivîsandin, tê de kesayetiya wî ya zor mirovane, hestedar û pîr zana diyar dibin, û ramanên wî jî tîn nasîn)).

Palo Rabe*

Rezoyê Osê

Palo , ez gorî , rabe...

Xewa şêrîn ji hozanên weke te re nabe. Govend gera ye, dîlan mezin e, qet ranabe. Bi wî rengê te nivîsî, "Civîna Nemiran" timam nabe. De rabe qurban, serî ji gorê rake û li firokxaneyê Hewlêrê, li Kurdistana azad, li pêşwaziya Cengawerên "anfalan", li lehengên govenda jiyanê, li Barzaniyên nemir temaşa ke. Rake, serî rake û ristên berdewamiya "Civîna Nemiran" li ba ke. Ristik dirêj e, pel têrê nake... Çarakê ji xwe re peyda ke. Aso bê kenar e, lê têra derd, kul , jan û azariyên gelê me ake.

Palo , ez gorî , rabe...

Çiyayên me bi fermîsk in, Zozanên me îske îsk in, deştên me, li ser gorbuhuştan, bi talîşk

in. De rabe qurban, serî ji gorê rake û li xaka xemgîn temaşa ke. Serî nextekî li ber xwîna gorbuhuştan daxê, şaşika xwe, ji serî veke, li ber wan raxe, lê li min jî ha be. Erê, gewdê min jî, pêşî bişo, tahir bike.

Palo , ez gorî , rabe...

Çem û cobarên me mişemiş in, dar û deviyên me xuşexuş in, kewên zozanên me, li hêlînên xwe digerin, na melisin. Belê, hedana Pezkoviyan nayê, li zinaran bi karî in, bi marî in, hespên mafparêzan bi hîrî in ... De rabe, berê te fereh, xew ji hozanên weke te re nabe. Rabe, bake: "Va penaberên me hatin, karexezalên me bi xelat in...". Rabe, bikeve pêşiya cemawerê pêşewaz û sirûda "kes nelê Kurd mirdiwe..." bibilîne. Rabe, bila zinar û çiyayên Barzan sirûda "Ey reqîb..." li hev

vegerînin, da xumîn û gumînê bi felekê bixin, wê bihejînin.

Palo , ez gorî , rabe...

Kurihên çavên me ji girî kul in, perdên guhên me ji gumînan ker in, hestên me ji perçiqandinê mas in, dêmên me û welatê me ji êş, kul û derdan bewî ne, zimanên me di gewriyên me de lal in, hêriz di cergên me de pûç in, xelat û mizgînî li ba me bê wate ne, demên salê li ba me weke hev in... de rabe, rabe dengekî bi ser Leyla Qasim de bijênîne, bila desmala destê xwe sivik bihejîne , da govenda Nemiran , li pêşiya "Civîna Nemiran" bigerîne ... bila bi madgeşî û xwîaşêrîni , dengekî, bi pêşewazî, ji mêvanên Çiyayê Barzan re, bilîlîne... Erê, dengê lîlandinê, ji me re, hem hêriz e, hem mizgîn e, hem jî xwîna nû, di rehan de, digerîne, dikelîne. Bila bake: "va anfalkirên me hatin, va firêliyên karexezalên Çiyayê Barzan hatin... Ez di qurbaniya xwe de bi qurban bim, di nemiriya xwe de bi heyran bim... Werin, mal mala we ye, çiya çiyayên we ne, azman azmanê we ye, xak xaka

we ye... bi xêr hatin, li ser çavan hatin... xaka azad we hembêz dike, hatina we pîroz dike. Belê, serê şehîdan natewe, lê ez serê xwe li ber we ditewînim, ez ji we re hem xelat im, hem mizgîn im, hem jî xwîşka bi birîn im.. De werin, bi delalî, li civîna me, bihêwirin û li asoyê welatê xwe bibin ronî, bibin keskesora hêviyên çilmisî, da hûn welatê xwe geş bikin, biçîsînin...".

- 1 -

Palo , ez gorî , rabe...

Gêra "Civîna Nemiran" teng e, bi sînor e, şahsiwarê vê civînê, Barzaniyê nemir, bi nehtor e, textê mîrnişîna Kurdezadan dor bi dor e,... De rabe, sînorên bedbextiyê bişikîne, nehtorên sexteşiyânê ji meydanê rahilîne, mîrnişîna padîşahan bi zêravê bikeşxîne...Rabe, rabe mizgîniya vê hatinê bigihîne, bila xaka azad xwe, vê payîzê, hilweşîne û gurzek gulên rengîn pêşkêşî mêvanên çiyayê Barzan bike û wan li xwe vehewîne... Reng e, dilê wan bi kul be, kula wan ji dil be û ji beyabanên biyaniyê ferehtir be, ji libên sîlaka wê ziwatir û gelektir be... kula lînepirsîn û

dûrketina penaberiye be, kula bêrîkirina xaka şil be... Bi wan bide zanîn, ko xaka welatê wan rêzgir û dilnêrmîn e, di payîzê de gulan ji wan re difûrîne, ava şêrîn ji tehtë diderîne û bayê jiyane, li her derê, dilivîne.....

Palo , ez gorî , rabe...

Va payîz e, payizok e... dewkeyênan meşk çirandin, bêrîvanan şîr rijandin, bilûrvanan va bilûrên xwe hilandin, zirnevanan va ne zirne li kirasan vegerandin, rojîgiran bang û bendên xwe dirandin... De rabe, darê şivantiyê bihejîne, kehnîkên çiyayê xemgîn bilivîne, biteqîne, perdê ji ser dar û deviyar, deşt û zeviyar bide alî û roja asîmanê bilind dagerîne... bila serê xwe li ber Cengawerên me bitewîne, bila bêje: "Ev mêrxasên rojhilat in, ev gernasên bêtebat in... berz û bala ne, mam û xal in, ev rastiya vê şûnê ne, ev xwedanê cih û war in...".

Palo , ez gorî , rabe...

Ji xwe ha be, rewşa berçav bi coşe û hêriz nabe , li ser pêkan biqelize, xwe hêdîka bilivîne, bayê "Civîna Nemiran" ne şikîne, li civînê melikê

Kurdistanê Şêx Mehmûd û qehremanê çiyê Barzanî ne, wa bi hev re, rûniştî ne, Qadî Mihemed li Mehabad wa bo wilo Çwarçira vêdixîne, Şêx Saîd jî va sûriha kevnedêrîn li Amedê dixumîne, Nûreddîn jî, bi goyînî, zîz dixwîne. Civîn giran e, bi dawî nayê, tu çarakê ji vê rewşê re xweş bibîne, bi dizîka, bi hêdîka vê bûyerê bigihîne, bibilîne... qet nebêje min nizanî, Cengawer û serkanên me ji hev ha ne, ev giyanên bêguneh in, bi rewanî li dera ne... ji hev ha ne, ji hev ha ne...

Palo , ez gorî , rabe...

Bila îro ev pêşwazî li bîra be, li bala be... va him him e, va gurîn e, va serkanên vê civînê li herderî rûniştî ne, bendewarê cengawerên nemirî ne... Belê Palo, ew bi xwe jî timî sax in, bi jiyî ne, bendewar in, bi hêvî ne... Va dibînin, alên rengîn rêz bi rêz in, li hêlînê vehewî ne, xaka azad kurdezadan dicivî ne, gul û reyhan bo mêvanan difûrîne... Va serkanên mîrnişînê ji civînê derketî ne, ew dizanin, ne li benda tukesî ne, ew dizanin ev çî rewş e, çî

birîn e, giyanên wan berî niha hevdû dîne, bi şêranî lev civîne, ji hev ha ne, xwexwedî ne, hemî sax in, ne mirî ne, soza wan jî ev civîn e.

- 2 -

Palo , ez gorî , rabe....

Va te dît û tu dibînî, ev çend sal in dilbirîn î, lê birînên me axivîn, gul û beybûn, li welatê me, pişkivîn... Va Nemirên vê civînê, mil li mil in, bi şîranî, pêşewaz in, ne bi kul in... Ew dendika heskirinê, ko çandibûn, va teqiya , bû bi şax û her weha jî ber girtiye. Rabe Palo, dilê min jî dilodîn e, ew bi xwe jî wek Nemiran, rikgîriyê nahebîne... Va serkanên vê civînê ji civînê derketî ne, ew dibînin Kurdewarên çarkenaran lev civî ne... rabe Palo, mizgîniyê bigihîne: "Miletê me, bi sayiya we navdaran, wê hevgirtî tim bimîne". Tu jî Palo, çavnegirtî, pênûsa xwe verişîne û, ji nû ve, vê civînê bidomîne.

.....

((Em jî mîna wî, bi hest û dilgermiya wî, bi wî re, bi hevalê xwe yê nemir re bêjin: Heval Rezo rabe.. rabe.. civata me jî bê te temam nebe.. ! – Kovara Pirs)).

• Palo: Mele Ehmedê Palo (1920 -09.05.1991) helbestvanekî Kurd e. Li bajarê Qamişlo, herêma Cirkîkê bi cî dibû. Poyemek, ji deh hezar malik, bi navê "Civîna Nemiran" hûnabû. Zîlana poyemê wisa bû: Palo dimire û, li wê dunyayê, E.Xanî dibîne. Palo dixwaze, di riya E.Xanî re, navdarên Kurd û goriyên kurdevariye binase. Wilo, E. Xanî ji Palo re dibe rêber û navdaran bi wî dide nasîn .Wilo, wî dibe civîna navdaran, ko navê "Civîna Nemiran" lê dike. Palo, ji dût ve, govendeke mezin dibîne. Sergovend jî keçeke spehî, ciwan, naz, cansivik û çeleng e. Ew keç, di sergovendê de, desmalekê bi destan dihejîne û govendê, bi xwe re, dilivîne. Palo, ji E.Xanî dinase, ko ev keç Leyla Qasim e. Bi vî awayî, her navdarekî Kurd ji Palo re dibe sernavek û poyêma xwe dihûne.